

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTANÊ LI SWËD

## ARTİSTÊN KURD LI SOVYET



## KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWËD

## NAVEROK

Saşiyên me kurdan.....	3
'Greva xwebîrçihîstnê	
Li Swêd.....	5
Kultur û ronakbirên	
Kurd.....	6
Çon egeyce seretayekî	
bawerpêkiraw bo edbi	
kurdi.....	10
Artistên Kurd	
Li Sovyet.....	12
Berpirşyanya karê	
berhevîrûnê wejeya	
kurdi ya devki.....	15
helbest.....	17
Cografya Kurdistanê.....	18
Xalitiya Gulê.....	20
Namên xwêndevanan.....	21
Xaçerêz.....	22
Mendalê Mamoste.....	23

○

Berpîsiyar

A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan  
A. M. GILLYRaxistina Nîvisaran  
SEYRAN û GULBAHAR

Redaksiyon

KEYXUSRO SİPAN-MAHMÛD  
LEWENDI-BENGİN BOTANI  
ŞORİŞGÊR ESKERİ-ROZA SEYRAN

○

BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.

## ADRESS

Kurdiska Riksförbundet,  
Tunnelgatan, 14, 3 tr.  
111 37 Stockholm/SWEDEN  
TEL : 08 / 11 23 42

Prenumeration: Medlemmar  
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.  
Postgiro: 64 38 80-8

Xwendevanên Hêja,

Me, dî hejmara buhuri de li ser rewşa Berbangê, ji gelek hêlan ve û bî fireyi ditin û baweriyêن xwe nîvisand. Hin name û nîvisarên rexnegir, ji aliyê xwendevanan ve ji hatin pêşkêş kîrin.

Me heta iro dî piraniya hejmaren berbangê de, daxwaza pêşneyar û rexnen we yên li ser naverok û zimanê Berbangê kîr. Lê mixabin, heta iro bersiva van daxwazên me— ji derveyê du-sê dengan — nehatiye dayin. Gelo bêbersivmayina Berbangê an bêdengmayina xwendevanên Berbangê ji çi ye ? Bê guman mirov dikare li ser gelek sedeman bipeyive û me bî xwe nîhêrinêن xwe yên dî vê xisûsê de dî hejmara buhuri de diyar kîr. Em hêvidar in, dê bî kêmani endamên Federasyonê ji kovara xwe re xwedi derkevin û wê bîparêzin.

Ji aliyê dün ve, divê name û nîvisarên ku bî hêvi û daxwazên serketinê ve, bî pirozkîrin û bî daxwaza handana( teşwiq kîrina) xebatkarên Berbangê ve, dagirtine ji neyên ji bir ve kîrin.

Piraniya name û nîvisen bî vi rengi ji derveyê Swêd tê. Em ji hemûyan re spas dikin û bî taybeti ji kekê OSMAN SEBRÎ re .. ji bo hemû name û şiretên wi û ji bo alikariya wi ya ji Berbangê re; bî wi zimanê hêsa, paqîj û zelal ve...

Dİ XWEŞİYÊ DE BİMININ  
Le Gel Xoşitan

BERBANG

## BERBANG

## NAVNİŞAN

Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê : 50 Kron, 30 DM.

Berbang, Tunnelgatan 14, 3 tr.  
111 37 Stockholm/ Sweden.  
Tel : 08 / 11 23 42  
Postgiro : 64 38 80-8

# Şasîyêñ me kurdan



*Osman Sebri*

Berî ez di warêñ şâşî û kê masiyêñ me kurdan da bipeyivim, dixwazim xwendevanê n Berbangê serwextî rastiyeke tehl û bêmirêş bikim. Heya li ser şasîyêñ me kurdan peyivinê giran û biyanî nebînin. Ji ber ku hin nivîsevan û helbestgoyêñ kurd ji bo bikarin xwe tê xin çavêñ xwendevanan bi ramaneke çepel pesna me kurdan didin. Hinekêñ wan dixwazin kurdan xurttir û mîrxastirêñ gelêñ cîhanê rave bikin. Hinek jî dixwazin zimanê kurdî koka zimanêñ Arî bidin xuyakirin !..

Tevî ku cîhan dizane em kurd milletekî bindes-tin, zimanê me nehatiye civandin, nehatiye xwen-din û em wek gelêñ mayî nizanin bi zimanê xwe binivisin. Lê divê ev celeb kes bizanin ku agahî û çav-darî rewşa me ya kirê t û zimanê me yê pij û belave. Dil dixwest ku ev camêrên han bi awakî zana û bîr-bir kêmanî û şasîyêñ gelê xwe bidin ber çavan. Heyanî gel serwextî rewşa xuya kirê t bibe û ji wan şâşî û kêmaniyan bi dûrkeve, ne di nav wan şasîyan da vezele û vegevize.

Gava yek li rewşa me kurdan hûr be, di jîna me ya civakî da gelek şasîyêñ kûr û giran dibîne. Ev şasîyêñ han ewqas girs û bêmirêsin ku di rehêñ gel da riçine kambax û cankuj belav kirine. Gelê kurd gî-handine vî warê bindestiyê ku îro di nav da vedige-vize û dinale. Van şasîyêñ ku di canê gelê me da cih girtine û berê wî ji ya çak dane aña, carcaran wekî filîmekî sînemayê di ber çavêñ xwe ra dikiş-nim û lê hûr dibim. Dixwazim riça van şasîyan bibînim û serêñ wan binasim. Ka çawan ev şâşî keti-ne canê gel û bi ci awayî em dê bikarin ji canê gel bi derxin û berê wî ji şasîyan bidin aña.

Berî her tiştî min ev yeka han da ber çavêñ xwe, ku bersiva wê bibînim: ji bo ci em kurd bi hev ne bawerin û bi xelkê bawer dibil, çima em ji hev hez

nakin û bi gengazî xwe dispêrin xelkê ? Ez geleki ji bersiva van herdu pirsan geriyam. Min serê xwe westand dawî bawerim ku gîhame bersiva wan. Heke baweriya min di cihê xwe da be, ji bo min bextiyariyek mezin û hêja ye.

Şasîya mezin: Zanayêñ civakî gotine, "Gelêñ ku di rîzana xwe ya civakî da serwext bin, di jîna xwe ya siyasi jî xurt û jêhatî dibin". Heye ku vê gotina han berê min guhast rîzana me kurdan a civakî û qenc lê hûr bûm. Min dît şasîya me kurdan a mezin di saziya malbatê da dest pê dike. Ev şâşî, ji ber ne naşîna mafê jîna kurd di nav malbatê da çar bûye. Keça kurd wek pirtal hatiye kirin û firotin. Gava xwestine bidin mîr, bav û biran bi dilê xwe, goreyi kar û mesleheta xwe dane mîr, ne bi dil û daxwaza wê. Jê ne hatiye pirsîn, ka qîma xwe bi mîrê ku dixwazin bidinê tîne an na, bê dil dane mîr. Bê gu-man jîna ku bê dilê xwe mîr bike nikare ji wî mîrî hez bike. Pirr caran rikeke mezin dikeve dilê wê. Jîna mala ku bê dil biçê dibe jehr. Rika wê jîne ne tenê digehê mîrê ku danê, lê vedigere ser bav û bî-rayêñ ku ew bê dil dabûn mîr jî.

Destpêka zewacê li ser daxwaza mîr dibe, haya keçikê ji tişteki nîne. Heye ku xortê ew xwestibû jî ne dîtibe û ne naşibe. Lî bav û biran ew dane mîr bê ku jê bipirsin, ka ew zewac bi dilê wê ye an na !.. Ji ber ku ew zewac bi dilê mîr bûye, piştî ze-wace şerekî mîr ji jîne hez dike, roj, meh, sal di-borin, zarok dibin bê ku rîya hezkirinê bi dilê jînikê kevê. Gelek caran rikeke mezin di dilê wê da cih digire. Jîna digel wî mîrî jê ra dibe dûjeh. Di kir û tevgera malê da û dansitandina mîr û jîne da de-rew dibin paresteka wê. Gava mîr serwextî rastiya rewşa jîne dibe ew hezkirina wî ya berê yekcar di-mire û vedigere dibe rikeke malkambax û cankuj. Ji



bo ku zewac negihê warê berdanê, ew jî derewan li jinê dike. Jîna ku divyabû di navbera mîr û jinê da pîroz û berxudar be, dibe jehr û kambaxî û li ustiyê herdûyan tê te rapê çan. Dawî ew rik û neyarî, xap û derewkerî di serî û dilê n zarokê n wan da jî cih digirin.

Ji ber ku keç hundurê malê baş dinase û agahî hemî kir tevgerê n diya xwe ye, dibe şahîdê derewê n ku dê li bavê dike. Law jî derveyî malê dizane, dibîne dibe şahîdê derewê n ku bav li dê dike. Holê zarokê n wan dersê n derewan ên pêşin ji bav û diyê n xwe distînin. Eve kurtebirr durvê zewacê li nav me kurdan. Ew zarokê n ku rastgoyî û qencî-xwazî ji bav û diyê n xwe ne dîtibin dê çawan bi gotina min û te bawer bibin, xwe bisperin me ?

A ecêb eve ku, heke biçî ber derê Kijan kurdî û


bêjîyê : "Ma tu keça xwe nafiroşî min ? " Heke bikaribe wê te bikuje. Lî dema diçî ber derê wî û dibêjîyê : "Ez hatime keça te ji lawê xwe ra bixwazim". Li te vedigerîne dibêje : "Tu yê cilhezar, pêncîhezar, şêsthezar lîreyê n Sûri bîdi". Tevî ku em dizanin li Cizîrê heyâ dusedhezarî qelenê keçan hatiye sitandin. A kambaxtir ewe ku bavê keçê çiqas qelen pirrtir bistîne, ewqas xwe serbilind dibîne. Wey ne xwezî bi wê serbilindiya ku di keçfirotin û rureşiyê da dibînin ! ..

Piştî ku min bi salixdaneke serpilkî lê gelekî tehl û tîrs çêla zewacê li nav me kurdan kir, pirr girîng dibînim ku holê dengê xwe hildim û gazî bav û birayê n keçan dikim: Gels biran ! Keçen xwe aza bîkin, Keçan bê dilê n wan medin mîr. Sitandina qelen keç firotine, bê rûmetiye, ne karê camêrane.

## MIRINA CEMAL KEMAL ALTUN

Li Almanyayê li bajarê Berlinê dî 30' ê tebaxê de multeciyek ji Turkiyê dî mahkemê de ji bo protesto kırına Hukumata Almanyayê xwe ji qatê şesan da avê t xwarê, intixar kir.

Ji bo vê buyerê li herderê Almanyayê û Ewrûpayê tevgerê n protestoyê pêkhatin. Û her weha li Swêd ji roja 4' ê Ilonê 1983, Federasyona Komelê n Kurdistan ê bi hinek komelê n dinê re ji meshek çekir. Meş ji Sergelstor (Stockholm) ê dest pêkir, heta ber konsolosa Almanya Federal. Li ber konsolos li ser navê Komi ta Karger axaftinek çê bû û dûre çelengek reş danin ber konsolos û nameyek protestoyê ji dan konsolosê û daqiqeyek ji bo hemi şehid û ji bo Cemal Kemal Altun sekîna hurmetiyê kırın, dî pêre miting bi bê dengi bela bû.



Cemal Kemal Altun



# GREVA XWEBIRÇİHİSTİNÊ

LI

Hêzên demokratik ên Kurdis-  
tan û Tirkîyê bi hev re li dijî cun-  
ta faşist û ji bo piştgiri bi girti-  
yên li girtixanêñ Kurdistan û  
Tirkîyê re dî pêncê Tebaxê de li  
Swêdê ketin greva birçibûnê.

Greva birçibûnê li du bajarêñ  
Swêdê pêk hat ji vana yek li  
Stockholmê yê dim ji li Uppsala-  
yê.

Li Stockholmê 64 kes ketin  
greve ku ji wan 10 ji jîn bûn. Li  
Uppsalayê ji 12 kes ketin greve.

Olan û dengê greve li her derê  
Swêd û li Ewrûpayê belav bû. Dî  
dema greve de kampanyayek im-  
zayê ji hate vekirinê. Bêyi vê ji  
nameyên protestoyê hatin şan-  
din ji cûntayê re.

SWÊDÊ

Greva birçibûnê bal û mîla pir  
kesan kişand, çi Swêdi, çi bıyanîyên ku li Swêdê dijin piraniya  
wan alikari ya xwe jê kêm neki-  
rin, ger bi imze û ger bi alikariya  
maddi.

Sekreterê kar û barê têkiliya  
navnetewi ya sendika karkerêñ  
metal li Swêd; bi xwe hat ciyê  
greve, piştgiriya xwe bi mesajekê  
amade kir.

Rojname, radyo û televizyona  
Swêdê dî program û rûpelêñ xwe  
de ciyek fireh dan grevê, li ser  
greve gelek tişt gotin û nivisin.

Wezira bıyanîyan Anita Gradin  
û Komita Merkeziya VPK.yê (Par-  
tiya Çep a Komunist) ji bi mesaj-  
jîn xwe piştgiriya xwe ya bi gre-  
vê re beyan kırın. Anita Gradin  
dî mesaja xwe de bi kurtebiri  
weha digot: 'Ez silav û piştgiriya  
xwe pêşkêşî hêzên demokrat û  
pêşverûyan dikim ku ji bo mafêñ  
mirovayeti û demokrasiyê têko-  
şin didim'.

Ev grev bû nîmîneyeki gelek  
xweş ji bo hevkariya dî tê koşina  
piştgiriye de li derveyi welat, dî  
nav hêzên demokrat û pêşverû  
de.

# KULTUR Û RONAKBİRÊN KURD

*M. Ferzend Baran*

"Di welatên paştamayı de, nîşen (generasyonên) kevnar diji hêzên metingehkaran rawestine, û ji bo gerên iro ji rê vekirine. Em, yênu ku di nava şerê iro de ne, diwê dev ji piçûk ditina xebat û kirdeyêن bapirêن xwe berdin u bêdengi û posittîta wan tê bigiyêن. Ewana, bi çekên xwe yêne wê roje û qasi gengazi û zanina xwe şer kirin. Ü eger şer û xebatên wana deng nedaye, xwe ranegîhandiye cihanê, sedemê wi kemaniya rêkûpeki ne bû. Rewşa cihanê wê demê gelek cihê bû. Em iro bawer m û dizanin, ku em dê serkevin. Lê ji bo ku em bigiyen iro, diviya çend serihildanên eşiri çebûna, çend raperinên gundiyan tekbiçûya, çend meş û libexwedan bi destên metingehkaran biperçiqiya".

Frantz FANON di gotara xwe ya di Kongra duemin ya Niviskar û pişka-reñ Reşik de qşen jorin digot. Kongre di sala 1959' an de li Roma yê pekhatibû. Ü Frantz FANON gotara xwe wisa didomand;

"Em, yênu ku iro barê tekdana metingehkariyê dane ser milê xwe, weki karê heri bingehin û tarixi, diwê van raperin û serhildanen bimeşin..."

Kiye Frantz Fanon ?

Ew ronakbireki Cezayiri bû. Dengê welatê xwe û xofa dijmûnen xwe bû. Wi di şerê rizgariya gelê Cezayir de rolek pir mezin leyist. Bir û baweri û ideolojiya şerê rizgariya gelê Cezayir aferand. Li Fransê xwend. Bû doxtor. Tişten ku li Fransê ferbû, diji metingehkariya Fransê bikarani. Prensibên WEK-HEVİ - AZADİ - BIRATI diji dayika van prensiban bikarani. Hemberi ideolojiya dewleta Fransê, ideolojiya neteweyi ya Cezayirê; hemberi kultura

Fransê, kultura ereb u Cezayir ; hemberi şexsiyeta Fransi, şexsiyeta ereb u Cezayiri derxist. Ü got:

"Di welatê paştamayı de kultura neteweyi, diwê navenda şerê rizgariya wan welatana be".

Piştî şerê rizgariya Cezayirê F. Fanon bû wezir. Xeberdan û nivisaren xwe bi navê "Nahletiyêن Cihanê" ve di pirtûkek de berhev kir. Hinek besenê vê pirtûka pir heja bi turki ji derketiye. Bi hemû zimanen ewrupai heye ev pirtûka heja. Kurd û bi taybeti ronakbirên Kurda diwê vê pirtûkê brixwinin û F. Fanon û baweriyêni wi binasın. Jean Paul Sartre ji ji pirtûke re peşgotinek pir xweş û manidar nivisiye. Sartre di peşgotina xwe de, dewlet û ronakbirên welatê xwe, anglo Fransê dadigehine.

**KULTUR - ZANEBUN - RONAKBIRI Û LIBERXWEDAN** di bir û bawerîya F. Fanon de gelek cihên giring digrin. Ew, hemû teoriya xwe ya weletperweriyê li ser van himan avadike. Kultur û pêşvexistina kulturê gelek gi-ring e, ji bo Fanon.

Rast Kultur ci ye ? Çiduhundirine?

Ger em Kurd û ger gelên din yêncihanê li ser kultur pir tiştan dibejin. Ev çend sedsal e, ku merivati behsa kulturê dike. Lê kultur ci ye ? Bêî mana wê ya Latinî, ku çand e, li ser vê yekê tu daxuyaniyêne wekhev ninin. Lê iro çû-yâna lêkolin u daxuyaniyan ber bi wek-heviyê dice.

Weki hatiye gotin, kultur yek ji du-sê peyvîn heri dijwar di ziman de ye. Li gelek cih u gehinekên curbecur de, bi gelek manen cihê hatiye bikaranin.

Di deshpêka kapitalizm û metingehkariyê de kultur, bese hêjaiyek serdestan bû. Kultur, neteweyen xwedi kultur, gelên xwedi kultur u miratiya kulturi bese li ba serdestan hebû. Bindest bê kultur bûn. Neteweyen bindest keriyen wehş bûn. Nîzanibûn kultur ci ye. Çeyiya serdestan ev yeka bû, ku pariek ji kultura xwe - her çiqas bi zordari be ji - didan bindestan. Li ser kulturenênerin û daxuyaniyêne welat û çinêne serdest wisa bû.

Piştî re muzik, edebiyat, pişe uwd wek kultur hat ditin. Ki xwedîlyê edebiyat, muzik û pişe bûya, xwedi kultur bû ji.

Piştî vê ditinê li ser mana û naveroka kulturê lekolin û humerîn zede bûn. Pişiyar çebûn. Çarçewa naveroka kulturê frehîr bû. Kultura çin û kategoriyan civati derket pêş. Mina kultura burjuvazi, kultura karkera, kultura gundiya, kultura jina, kultura zaroka uwd... Piştî hûrnerinan hat ditin, ku çin û kategoriyan civati ji hev cihê dijin. Gelek tişten wan ji hev cihê ne. Ü bi narmen cihê cihê dinêrin tişt û bûyeran. Ji ber vê yekê ji di nav tevai û yekitiya kultur de, kategori, berberi û curbecuri ji heye.

Ü van salen dawi, bi alikariya lêkolin û hûmerinan, puspor - bi taybeti antropolog u etnolog - gihiştin havilek wisa; bi tevayı û kategoriyan xwe ve, şeweyen jiyan û fikirandina gel kultur e. Anglo formê jiyanê bi xwe kultur e.

Formê jiyanê... Ev yeka pir tiştan dihundirine. Meriv dixwaze ku ji bo her warê formê jiyanê peyv û daxuyaniyen xas hebuya. Wê demê mana û naveroka kulturê dê çetir fahmbibuya. Lê mixabin gehineka iro bersiva vê daxwaziyê nade. Loma ji peyva kultur himen bingehin yêncivatek, geleki dihundirine. Zanebuna şiriki, pivek u normen civaki, tecruben civatê, şeweyen fikirandina gel, edet u tote, dan û standinê civaki, hemû di nav naveroka peyva kultur de cihên xwe digrin. Ü bêşik van hemû warên formê jiyanê, bi ziman rolên xwe yêncivaki dileyzin. Meriv bi ziman dikare hevdû têbigiye. Bi ziman dikare tecruben xwe ragihine hev. Zanebun u tevgeren civaki pekbine...

Li gor vê daxuyaniya li ser kultur, hemû gelên cihanê xwedi kulturek neteweyi ne. Ji gelên heri paştamayı ta gelen heri pêşketi hemu gel, xwedi kulturek xas u xweyi ne.

Her waha gelê Kurd ji xwedi kulturê neteweyi, xas û xweyi ye. Em bi dan û standinê civaki, bî edet û torêñ xwe, bî eşir û malbatêñ xwe, bî xwarin û li xwe kûrûnêñ xwe, bî ziman, zarav û devokêñ xwe, bî şerê xwe yê sedsalan ve xwedi formek taybeti ya jîyanê ne. Ev forma me ya jîyanê bî gelek hêlêñ xwe ve, ji formen jiyana gelên cîran û der û dora me cihê ye. (gelek hêlêñ wekhev ji hene).

Jî stran û govendêñ me ta rabûn û rûniştina me; ji şal - şepikêñ me ta helbestêñ Ehmedê Xanê, Feqiyê Teyra, Meleyê Ciziri; ji dawet û şayiyen me ta benîta me ya kengerê; ji qelhe û bîrcêñ me ta şêweyên peyvandin û silavdana me; ji leyistokêñ me yêñ zarakan ta bêriya pezan... hemû, van tiştan hemû perçen kultura Kurd in.

Bî sedsala ne, dî navbera serdest û bindestan de şereki dijwar domdike. Jî destpêka tarixa metingehkariyê heta roja me şereki dijwar, dî navbera biyani û gelên navxweyi yan de, ji heye. Jî sedsalan vir ve dî şerê gelên bindest û navxweyîyan de xebat û tekoşina kulturi cîhek gelek giring raguttiye.

Cîma ?

Jî ber ku, bo serketina şerê rizgari û azadiyê pêşketin û li ser riya pêşketinê de himêñ bingehin divê. Tu xelk heta bî şewe u xebatêñ curbecur li ser riya pêşketinê de himêñ bingehin yêñ civaki avanezin, ji bo ve yeki gav navêjin, bî ser naaktivin. Tarix şahidê vê yekê ye. Hêzên biyani û tacirker bî darê zorê, bî koteke, dixwazin formê jiyana gelên bindest û navxweyi ji, ji bo derkarin û qewitandina hêzên biyaniya, formê jiyana xwe diparêzin û wê du gel pêşketina tarix û civaki, pêşvedixin û modernize dikin. Jî destpêka tarixa zordariyê heta roja me, dijitiya heri bingehin ya dî navbera hêzên biyani û tacirkeran û gelên bindest ev bû ye.

Afrikayiyêñ reşik hemberê Societe Europeenne de Cultur, Societe Africaine de Cultur avakîrm. Ronakbirêñ Ereban ji bo armanca Dar - El - Salam rëxistinêñ kulturi çêkrin. Sereken Latin Amerikayi ji bo "Amerika Latini ya azad" di pêşengiya Simon Bolivar de civyan serhev. Wietnamiya di pêşengiya Ho Chi Minh, Ngo Tat To u To Huu de, dî sala 1948' an de kongra xwe ya kultura neteweyi civandin. Li cihane tu ronakbirêñ gelên bindest (ger sosyalist, ger welatperwer u de-

mokrat) sinoran dananine navbera şêwê u warêñ tekoşinê. Her xwestinê li ser riya pêşketina civatêñ xwe himêñ bingehin avabikin. Rêberiya şerê rizgariya gelê Wietnam di destê sosyalist u welatperweran de bû. Rêberen gelê Wietnam di navbera sala 1945 û 48' an de ji bo kultur - edebiyat û pişeya Wietnamê van tiştan bîcîhanin: Seferberiya xwendin û nîvisine, cihê Fransizi bikaranine zimanê zîkmaki, xebata nûnjendina kultur û miratiyêñ kulturê, lêvebûn û bidervevèbûna kulturê, bîcîhanina kulturek zaniyar û neteweyi, zabûna musika welatperwer û şoreşger, kongra kultura neteweyi.

Min minaka Wietnamîyan ji bo vê yekê wisa direj da; ger sosyalist, ger welatperwer, rîber u ronakbirêñ gelên bindest divê ji bo parastin û pêşvexistina himêñ bingehin yêñ formê jiyana gelên xwe bixebeitin. Hebûna welêt, parastin û pêşvexistina kultur, ziman û formê jiyana neteweyi esas e. Bingeh e. Destpêk e.

Esas e, lewre tekoşin, xebat, şer, lebat bese dikare li ser hebûna welat, gel, kultur, ziman û formê jiyane jindar be.

Bingeh e, lewre pêşketin, pêşvexistin, serketin bese dikare li ser bingehet tekûz hêt holê.

Destpêk e, lewre tarix û dem her diherke, pêşdikeve. Tişt dêt guhertin, modernize dibin. Ji bo modernizê kîrin, pêşvexistinê divê himêñ bingehin hebin. Van himêñ bingehin bibin destpêk.

Mixabin gengaziyên me hê destnadin, ku em kovar û rojnamen kulturi, edebi u pişeyi biweiseñin. BERBANG, dî vi wari de kovara heri berbiçav e. (Ev çendê dawi li Swed bî nave ROJA NU kovarek kulturi dest bî weşinê kir. Ü li Englîstanê ji, bî tipêñ erebi û bî zaravê sorani kovarek bî nave ÇIRÜSKA KURDISTAN dêt weşandîne.)

BERBANG gihaye hejmara xwe ya 11' an. Em bunêrin ka dî rupelên BERBANG'ê de ci heye ? Piraniya nîvisaran li ser ziman u problemen zimanê kurdi ne. Li ser diroka zimanê kurdi yê nîvisandi, têkiliya zaravê zimanê kurdi, bikaranina elfaba kurdi, nîvisar hene. Çend heb çirokêñ geleri û nîvisar û helbestêñ welatperweri ku li ser tarix, edet û tore û şere gelê kurdu in, ji heye. Li ser folklor, zargotin û weşanen kurdi ji çend nîvisar heye.

Ango piraniya nîvisar, wêne û helbestêñ BERBANG'ê li ser him û refen civat û jiyana kurdi û pêşvexistina wan e. Beri nûha çendeki ez li Paris' ê bûm. Weki dêt zanin, li wir bî alikariya dewleta Fransê enstituyek kurd vebû. Ji

nûha ve piraniya orijinalen kovarêñ kurdi li enstituyê civiyane. Min hinek nêhîrt wan kovaran ji. Piraniya nîvisar u têdehinêñ wan kovaran ji wek yêñ BERBANG' ê ne. Cîma wîsa ye ?

Bersiva vê yekê li ber çav e; weki ronakbirêñ gelên din yêñ bindest, ronakbirêñ kurd ji li dû kok u rehêñ xwe ne. Dixwazin xwe bigihin kokêñ xwe. Heyinêñ xwe bibinin, binasun, derxinin. Biparezin û hêdi hêdi pêşvexistin. Li ku zordari û asimilasyona hêzîn biyani û tacirkeran hebûye, li wê derê parastin, lê xwedi derketin, lêkolîn û pêşvexistina dewlemendi û heninêñ wê deri ji hebûye. Yek ji vatîniyêñ (wezifîn) heri giring yêñ rîber, serek û ronakbirêñ wê derê, parastin û pêşvexistina dewlemendi û heninêñ neteweyi bûye.

Jî bo kesen ku ji asimilasyon û niyêñ neteweyi dûr in, dibe, parastin û lê xwedi derketina heninêñ neteweyi eceb bê. Lewre ew, jana şexsiyeteki neteweyi nakêşinim. Problemên wan yêñ wîsa nim. Wâha pîsta xwe daye ser ziman, kultur û şexsiyeteki azad. Gelên bindest û ronakbirin wan jana perçîqandina ziman, kultur û şexsiyeta xwe dijin. Mejiyên wan bî vê jana reş ve tiji ye.

Jî bo kurdan û ronakbirêñ wan ji wîsa ye. Kurd ji, ji zû ve ye jana perçîqandina ziman, kultur û şexsiyeta xwe ya neteweyi dikêşinim. Barê vê jani li Kurdistanâ Irak' ê kemtr e. Ji ber ku li wir tu cari ziman, kultur û edebiyata kurd qedexe ne bûye. İcar barê jana reş li Kurdistanâ Turkiyê hin bêtür e. Ji ber ku li Turkiyê dewleta Turk ya zorker ji damezrandina xwe vir ve her tiştê ku bî navê Kurd û Kurdayeti yê, qedexe kiriye. Hebûna gelê kurd na nase. Ü pur bî xurti diçe ser gelê kurd û Kurdistanê. Jî bo ku bikaribe gelê kurd asimile bike, bî darê zorê her tiştî dûke. Tu tiştîk xema dewleta Turk nine. Li Kurdistanê her tiştî têkdide. Parastina dewlemendiyêñ antik û tarixa kevn ji xema dewleta Turk ya hov nine. Du bûyeren rojêñ dawi, ji bo peyîndina vê yekê, minakêñ heri ber bî çav in.

Büyera yekê; li der û dora Herran û Ruha (Urfa) yê ye. Dewleta Turk ev çendeki ye dixwaze li ser Ferat' ê bendeki avê avabike. Mintiqeyek heft sed milyon m dê di bin avê de bumine. Dî nav vê mintiqe de ji hefteyi (70) zêtrîr gund û bajarêñ piçük hene. Evana ji dê dî bin avê de bumine û winda be. Lî ya heri giring mintiqe kahniya dewlemendiyêñ tarixi u arkeolojik e. Medeniyeta hezar salan li wê derê ye. Ji Kalkolilitika ta Urartuya, gelên qewan li mintiqe bî cih bûye. Mintiqe di navbera Mezopotamiya - Anatoli u Suriyê pîr e.

Hinek beşen destana Gilgamiş ji di mintiqê de hatibûn ditin. Dî navbera Samsat - Bozova - Karkamış û Herrane de kêmani 5000 salên meriv bi cih bûne. Lî gor diroknaş Edessai (Ruha - Urfa) Mateos, bajare Samsat' ê ji Bizans Commagenera payitexti kriye. Lê sibê roj wan medeniyet û tarixa hezar salan dêwinda bibe, biçe. Her mina mintiga Harpit û bede ava Kebanê...

Büyüra duev, xeberdanek serekcum-hurê dewleta Turk general Kenan Evren e. Beri nuha çendeki K. Evren û serbaxêن cunta leşkeri bi hev re çûn Çolamerê. K. Evren li wir xeber da. Xeberdana camêr, ji seri heta bini li ser Kurdan bû. Bi kurtebiri tiştê digot ev bû; Kurd ne Kurd in, ew Türk in. Kurd û Kurdistan nine, Turk, Turkiye heye. K. Evren li Çolamerê wek xortek 18 sali dişiruya, xwe dihêjand û li ber çavên hemû cihanê derew dikir. İdeoloji û siyaseta dewleta Turk wisa ye. Merivai, zaniyari li ba dewleta Turk nine. Sosyolog û niviskare hêja İsmail Beşikçi di pirtûka xwe ya dawi, ku weşanxana Denge Komâse bi nave "ji Unesco' yê re name" çap kriye, de zordarı û hovitiya dewleta Turk baş dide xuyadan.

Ji ber zordarı û hovitiya nediti ya dewleta Turk, dilê Kurdistana Turkiyê bi jana perçiqandina ziman, kultur û seksiyeta neteweyi hin zêdetur tiji ye. Ev yeka di rûpelên HAWAR û ROHANI' yê de baş xuya ye. Kovarêن HAWAR u RONAHI kovarên heri bedew u hêja yên Kurdêñ Turkiyê û Suriyê bûn, ku pişti tekçûna raperiya SEX SEİD derdihat. Dî her hejmarê van kovaran de ji bo gelê Kurd qırın û gazin hene. Dî hejmarâ 5' an ya RONAHI de (1. Tebax- 1942) li ser kovarek kurdi (GELAWÊJ) nivisarek kurt heye. Nivisar bênav e. Lê, xuya ye bergerêñ RONAHI' yê nivisine. Dî dawiyâ nivisare de wisa dêt gotin;

"Herweki bergerê Gulavêjê gotiye, kurd nemaze iro, ji her wexti bêtir hewcedari kovar û kiteban in. Ji ber ko sibê, gava miletên dînyayê dewh u doza heyina xwe bikin, yê ko heqê miletan lêk vekin, li kovar, kitêp u rojnameyêñ wan ji dê bipirsin.

Ji lewre em ji digel bergerê Gulawêjê dibejine kurdan, nemaze kurdêñ Iraqê: Kurdino ! ne bi tenê bi çar, lê bi çardeh destan bi Gulawêjê bigirin û qedrê wê bizanîn". Qırın, qırına parastun û lê xwedî derketina henin û dewlemendiyêñ neteweyi ye.

Qırın û jana perçiqandina seksiyeta neteweyi li ba birewer û ronakbiran bêtir e. Ji ber ku ew ji xelkê betir ji

derva re vekirine. Dan û standimên wan bi derva re heye. Ji xelkê zütür xwe nêzê tişt, baweri, raman, norm û normên nuh dikin. Ü piraniya wan di cigeh u refen bîyaniyan de xwe perwerde kîrine. Nêrin û nezbûna wan i tiştan cuda ye. Birrewerî û zanebûna wan, alikariya wan dike, ku bûyer û tiştan hin firehtur bîpivin. Loma ji pivekên wan hişk û girti ninin.

Ev tiştana hemû pir pozitiv û rind in. Bi alikariya van tiştan merv dikare guhertinan bibine. Hûr binere bûyeran. Ji keda kar, xebat û lebatan havilan derxine. Rêberiya guhertinan bike. Bi-be nûnerê tiştên nuh. Fonksiyon û rola ronakbiran ji zati ev e.

Lê ev yeka bi xwe re tehlîkeyek mezin ji dihundirine; ji xweyiya xwe, ji welatê xwe û gele xwe dûrketin. Trajediya ronakbirêñ welat û gelen bindest ev e. Ango di nav ziman, kultur, pivek, norm û dan û standinênuh de fetîsin, asimile bûym, seksiyeta xwe ya neteweyi winda kîrine. Ji ber vê yeke ji ronakbirêñ gelên bindest ji her kesi zedetir jana perçiqandina seksiyeta neteweyi dikêşin. Ji her kesi zedetir digirin û xwe dişin. Ev normal e. Lî ba hemû gelên bindest yêñ cihanê wisa bûye û dê li ba me ji wisa be.

Bawerîyêñ ronakbiran çi drîbe bila bibe, ew dîvê xwe bigihînim kokêñ xwe. Lî kultur, henin u dewlemendiyêñ neteweyi yêñ welatên xwe xwedî derkevin, wan biparezin û hêdi hêdi peşvebixin. Parastin û lê xwedî derketina do û iro ji bo leyлан, xewn û fantaziyâne, lê ji bo başturbûna sibê pêwist e. Başturbûna sibê û rojêñ pêş, bi rexistin û tekoşina gel ve gengaz e. Gel ji bi tiştên jê dûr û hic û pûc ve re-nakeve. Gel dîvê xwe û daxwaziyêñ xwe di nav tekoşinê de bibine, ku rekeve.

Ronakbirêñ gelên bindest, ku şerê rizgariyê dane û iro serbest in, vê yekê baş bicihanine. Beri her tiştî xwe û der u dora xwe ji kriza seksiyeta neteweyi fulitandine, xwe gihandîne kok û refen xwe, yekitiyek jîndar di navbera xwe û welat, gel û kultura xwe de avakurine. Ü di demek dîrêj de serketine. Welat û gelên xwe rizgar kîrine.

Em binêrin, di qırma me ya 20' an de, rîber u pêşengêñ hemû şerêñ rizgariwaz ronakbir in. Bir û baweri û metodêñ xebata wan ji hev gelek cuda be ji hemû, yekitiyek bi welat, gel û kultura xwe ve damezrandina. Dan û stan-

din û yekitiyek hêja, jîndar di navbera baweri, raman, norm û metodêñ xwe yêñ nuh û welat, gel û kultura xwe ya kevnar de çekirine.

Problemê heri mezin û bingehin yê ronakbirêñ kurdan ev e. Nemaze ji bo ronakbirêñ Kurden Turkiyê wisa ye. Ronakbirêñ Kurden Turkiyê nikarin dan û standin û yekitiyek heja û jîndar di navbera baweri, raman, norm û metodêñ nuh û welat, gel û kultura xwe avabikin. An ji welat, gel û kultura xwe pir dûrketi ne. An ji ji tişt, baweri, raman û normên nuh re pir girti ne. Helbet ji herdû awran ji tu havileki dernayê. Ji ber vê yekê ji, tişt, afîradin û hilberiyêñ bimine û bibe reçeyek koka welat û gelê me dernakevin. Kurdistana Turkiye buye weki çoleki. Ji 10 - 12 milyon Kurden Kurdistana Turkiye, 10 - 12 niviskar an rojnamevanêñ Kurd derneket. Her waha 10 - 12 kesen pîspor, zanyar, diroknaş, ziman, musiknaş ji derneket. 10 - 12 heb roman, çirok, helbest, destan an pirtükêñ zarakan ji derneket.

Lê çi derket ? Bi hezaran, sed hezaran xort û keçen niv zane, mëji tevihev derket. Ev xebîtin, bûn serek û rîberen gelê Kurd. Ked, xwîdan û xwîna xwe rijandin li ber doza gelê xwe. Gelek ji wan bûn gorbehîst.

Lê mixabin, hezar mixabin di ser riya pêşketinê de himêñ bingehin yê formê jiyana gelê Kurd avanekirin, nikaribûn avabikin. Dan û standinek, yekitiyek xurt, jîndar di navbera xwe û welat, gel û kultura xwe de avanekirin.

Sedemê wêrânbûna Kurdistana Turkiyê, tunebûna ronakbirêñ modern e. Xwendayêñ me pir in. Bi hezaran e. Dî vê mane de ronakbirêñ me ji pir in. Lê kêm û paştemayı ne. Weki kultur mana ronakbiri ji gelek fireh e. Nemaze di welatên bindest û paştemayı de peyva ronakbiri ji pir tiştan dibundirine. Ji lewre di welatê bindest de kadur û merrîn pîspor yêñ warêñ curbecur kêm in. Kêmanîya pîspor û kadiran barê ronakbirêñ welatên bindest girantur dike. Dî welatên pêşketi de pîspori di pêşya ronakbirîyê de ye. Lî wir meriv hewce nine, ku him siyaset û tarix û him ji edebiyat û sosyoloji bizanibe. Pîspor û kadîrên pêşketi pir in. Organizasyon û muessesen wan hene.

Ronakbirê welatê bindest dîvê ber-pursiyare tarixa xwe û qırma xwe ya iro-

yi be. Mêjiyê wi nûjen be, lê dûre wela, gel û kultura xwe nebe. Dî mêjiyê xwe de wela, gel û kultura xwe biji. Lî henin û dewlemendiyê xwe hûr binêre. Ü tiştê heri giring, pêşvebixine. Ronakbir kesê pêştexiste ye. Anglo pêşverû ye. Parastin û pêşvexistin du (2) ruyen rasti û sedemê hebûna ronakbir e.

Pêşverûti behsa teori û baweriyên şoresser kîrm nine. Pêşverûti, di her wari de tiştan pêşvexistin e. Em dê hemû pêşverû bin, behsa teori û baweriyên pêşverû bikin, lê tiştan, hêl û warêni jîyanê pêşvenexim... Pêşverûtiya wisa ne pêşverûti ye. Ü pêşverûtiyek wisa tu havili dernâxe. Em dîvê xwe pêşverûtiyek wisa şas û çewt biparêzin.

Rewşa ronakbirêne Kurdistan Turkiyê ne baş e. (Di perçen din yên Kurdistanê de rewş gelek cuda ye. Jî ber vê, ez naxwazim di vê nivisara xwe de nêzi perçen din bum.) Ronakbirêne Kurdistanâ Turkiyê an bêî ziman, kultur û şexsiyeteki neteweyi, li dervayi van, bêî parastina van dixwaze tiştan pêşvebixine an ji ziman, kultur û şexsiyeta neteweyi wisa hişk diparêze, ku bernade ev pêşkevin.

Qasi xuya ye, di Kurdistanâ Turkiyê de du (2) kategori ronakbirêne Kurd heye. Bê şik ew kesen, ku xwenda ne, lê xwe li Kurdiyê danaynîn, û tu tekiliya xwe bi kurdayeti û beşen xebata kurdayetiye daanynîn, dervayi van kategoriya ne. Hejmarêne van kesan pir in. Nivê xwendayêne Kurdistanâ Turkiyê ji van in. Jî asimilasyon û tırsa dewleta Turk, ji kurdayetiye dûrketime. Eger ronakbirêne me kêmâniyen xwe ji holê rakin û bi xebatek cûrbecûr û geleri (bi metodêne modern) rabin, van kesan ji - kêmâni piraniya wan - dê li xwe vege-nin.

Îcar xwendevan dîvê birveneke, ku ev dabeşkirina ronakbirêne Kurdistanâ Turkiyê bi xetêni giştî ve ne. Ez hêvidar im, ku em dê di rojêne pêş de bîkaribin hin bêtir ji nêz ve binêrin ronakbirêne xwe. Hin çêtr lê hûr binêrin û lêkolin.

Kategoriya yekem ya ronakbirêne Kurdistanâ Turkiyê, melle û seydayêne welatperwer in. Kahniya welatperweri û ronakbirîye ev in. Tarixa seydayan pir kevn e. Xwe digininin Mellaye Ciziri, Ehmedê Xani, Eliyê Heriri. Bâpirêne edeta welatperweriya şêx, melle û seydayan M. Ciziri, E. Xani, E. Heriri ye. Seydayêne me yên iro ji wir, ji kûri-

ya tarixa me têne. Jî sedsalan vir ve ye, ev ekola rêberiya welatperweriya kurdi dike. Welat, gel, kultur û tarixa Kurdan diparêzin. Dî nav gel de ne. Edet, tore û normêni jiyana gelê Kurd baş dizanin. Jî bûyerên der û dorêne Kurdistanê baş aghdar in. Mêjiyêne wan bi çirok, stran, zargotin, destan û serpehatiyêne Kurdistan ve tiji ye.

Lê mixabın ji derva re girtin e. Bi şik dinêrin derva. Zordariya hêzên bîyani, wana kiriye dijminê tiştên bîyani. Her xwestine henin û dewlemendiyêne Kurdistanê biparêzin. Ziman, kultur û şexsiyeta Kurd li ser nigan pêgirin. Hêla wan ya parastmê gelek pêste ye. Lê hêla wan ya pêşvexistinê gelek qels e. Lewre piraniyan wan, ji ditin, baweri, norm, pivek û metodênuh re girti ne. Jî xebatêne akademik, pîsporî û modern dûr in. Edebiyat, kultur û zaniyariya navneteweyi bala wan nekêşine.

Bî kurtebiri, ekola seydayêne welatperwer formê jiyana kurdi diparêzin lê nikarm pêşvebixin.

Kategoriya duem ya ronakbirêne Kurdistanâ Turkiyê, xwendayêne muh yên welatperwer û sosyalist in. Jî dest-pêka 1960' i ta iro nîfşek wisa ji Kurdistanâ Turkiyê derket. Ev nîfş ji di nav xwe de yek nine. Nêrinêne wan ji hev cuda ne. Le hêlén wan yen qerestristik nêzhe hev in. (Ez bi xwe ji, yek ji vê kategoriye me.)

Piraniya vê nîfş nû di xwendegehîn bilunda de xwendine. Avukat, doxtor, mamoste ûwd ne. Kêmani, xwendegega navin qedandine. Jî ditin, baweri, norm û jiyana modern aghdar in. Li ser teoriyêne muh raberiziyêne germ û kur dikin. Dixwinin û dînîvisinin. Tiştên nû, bûyerên cihanê bala wan dikêşine. Jî derva re, tiştên nû re pir vekiri ne. Bi lez û aktiv in. Jî welatê xwe, gelê xwe hez dikin. Bu xurti ji bo welatê xwe dixebeitin, têne girtin, têne kuştin. Dixwazin rewşa welatê xwe biguhêrinin. Welatê xwe pêşvebixin.

Lê mixabın xwendegeh, perweri û sistema dewleta Turk hebûna wan ya kurdi çelgandiye. Jî % 95' ên wan bi zimane turki difikirin. Nêzhe temamîya xebata wan ya siyasi, cîvaki û kulturi bi turki ye. Piraniya van di nav xwe de bi turki dipeyîvin. Nemaze peyvandînen wan yên siyasi hemû bi turki ne. Jî % 20 - 30' yê wan bi kurdi peyvandîne

nizanîn. Jî % / ) — ? )' yê wan bi kurdi nivisin û xwendinê nizanîn. Formê jiyana kurdi û ya turki di serê wan de tevihev e. Piraniya wan ji kultur û tarixa kurd dûr in, kriza şexsiyeta nete-weyi dijin. Xwe nadîn ber xebata ake-demik. Nêzi lêkolin û hûrnêrinê kür û fireh nabûn. Pisporiyê nadîn ber xwe. Keysa wan nine, ku niviskar, hozan, rojnamevan, sosyolog, etnolog, dirok-nas, zîmanzan, muziknas, diplomad ûwd bibin.

Bî kurtebiri ev kategoriya ji dixwaze bigohirine, pêşvebixe. Lê belê, bêî ku xwe bigihine kokêne xwe, bêî ku himêne bingehin avabike.

Bî kurti rewşa me wisa ye. Welatê me di nav nêzaniyek mezin de ye. Ronakbirêne welatêne me ji him kêm û him belengaz in. Kêmani û çewtiyêne wan pur in. Ü ji hêleki ji welatê me bi lez di-guhere. Eşîren me ji hev dikevin. Jiyanâ koçertiyê mina berfa ber royê dihe-le. Dan û standinê kevn wînda dibin. Ü asimilasyona dewleta turk roj bi roj bêtir dibe.

Dü gehineka iro de, vatiniya heri mezin û bingehin; derxistin, avakirin û berpêş kirina ronakbirêne modern e. Em wek welat, wek gel iro hewcedari ronakbirêne modern û pêşverû ne. Di çarçewek pêşverû de hewcedari yekiti-ya nûjen û kevnar in. Anglo hewcedari ronakbirêne, ku gelên din yan bindest ji zû ve ye derxistîye ne.

Li vir dîvê em tiştêk berbîçav bikin, ku daxuyaniyêne yên li ser ronakbirêne Kurdistanâ Turkiyê, bi xetêni giştî ne. Jî wan re lêhurnêrin dîvê. Em dîvê van daxuyaniyan vekin û sedemêne wan bidin ber çavan. Ü bê şik, ronakbirêne modern, ku daxwaza me hemûyan e, disa dê ji yên hene, derkevin. Armanç, kêmâniyan ji holê rakin e.

Weki me di rûpelên bûri de berpêş kir, ronakbirêne me ji êdi dîvê dan û standimek, yekitiyek jîndar di navbera muh û kevn, nûjen û kevnar, kok û pi, kahni û rîcêne avê de pekbine.

Dî destpêka nivisare de, Frantz Fanon digot; kare me yê heri bingehin û tarixi, domandina raperin û serihildanêne kevn e. Domandina serihildanêne kevn? Belê rast e. Weki din rî nine. Lê li gor dan û standinêne iro û di rîberiya ronakbirêne, ku berpîrsiyare qırna xwe ne û welatê xwe, gelê xwe, kultu-ra xwe di mîjiyê xwe de dijin, de...

# —ÇON EGEYNE SERETAYEKİ BAWERPÊKIRAW BO EDEBİ KURDİ

II — Dr. Kemal Fuad

Emê nê tewe ser "Marife Tu Pirşalyari", ke le rûy şêwe w nawerokewe le we eçêt ke le layen daniştuwani nawçeyi Hewramanewe wîtrabê, belam bêcge lew beytaney ke Mamosta Reşid Yasımı bilawi kirdûnewe, hiç beşê ki tir lem "Marife Tu Pirşalyari" ye nedozrawetewe. Her be qsey Mamosta (Reşid Yasımı, L 122) dû "Pirşalyar" hebûn, ke yekêkiyan pêş Islam û ewi tryan le serdemî Şêx Ebdulqadıri Geylani da wate le sedey duwanzehemi miladi da jiyawe. Ewey aşkıra ye Islam direng le nawçey Hewraman da bilaw botewe w be qsey (Ayetulla Xani Kurdistani, Şêx Muhamedi Merdux/ Kitabê Tarixê Merduxî. Beşi Yekem, Tehran 1955) "Mela Guşayê Kwêr" Nawyan birduwe, le sedey panzehem da Hewramiyekani be Islam û quran aşina kirduwe. Wa dyar e Hewramiyekan ke elên "Marife Tu Pissalyari" le quran Kontr e, mebestîyan lew kateweye ke ewan quraniyan nasiwe, wate sedey panzehem. Diyar e eger 'Pirşalyar' le sedey duwanzeham da jiyabêt, lay ewan le quran kontr e !!

Reng e em şire amojgariyaney "Pirşalyar" nextêk rastian tyia hebêt. Belam, bedaxewe, her ew sê - çuwar beyten ke Mamosta Reşid Yasımı bilawi kirdûnewe, itir hiçi tiri lê nazanirêt. Sereray ewe ke insan zor le rastiyan dilniya niye. Le ber ewe natîwanin emeş bikeyn be sereta bo edebi Kurdiman.

Hendêk lew bawere dan ke çuwarinekani Babe

Tayeri Uryani, ke le niwey yekami sedey yanzehem da jiyawe, seretan bo edebi Kurdi. Her kesêk nextêk aşinay zîmani farisi w zîmani kurdi bê t û serinc lew çuwarinane bidat, be asani boy derekewêt, ke ew cuwarinane, be hemû ew şewaney êsta le ber destan, le farisiyewe niziktir in ta Kurdi, le ber ewe natîwanirê bikrê be sereta bo edebi Kurdi. Sereray ewey ke le sedey panzehemewe ta sedey nozdehem, hiç core edebikma bewşewe ye berçaw nakewêt.

Itir emê nê tewe ser şiri ew şaireneman guman le bûn û serdemî jiyaniyan nakirêt w etwanin be dilniyayıyewe basi xoyan û şirekaniyan bikey. Kontrini ew şiraneş be Hewrami witrawin û emca be şewey 'Ceziri' w paşanîş be şewey 'Mukiri' w 'Silê manî'.

Kontrin Şair Hewramış ke ta êsta bo min sax bûbeê tewe Mela Perêşan e, ke serdemî jiyani egerê - tewe bo kotayı sedey çuwardehem û seretay sedey panzdehem. (4) Giringtrin şirekani ew (Mesnewiya Ssofi) yanan ke le jêr nawi "Perêşan Name" da day naw in, ke ta êsta le Êran, sê car bilaw kîrawnewe (du car le rojnamey Kurdistan da ke le salani 1959 - 1963 le Taran dereçû). Destnûsêki em diwaneş le kitêbxaney dewleti, le Berlini Rojava heye.

Duwa be duway "Mela Perêşan" ta kotayı cengi cihani yekem, be şeweyki nepiçraw komelek şar berçaw ekewin ke be şewey Hewrami şiryan witu-

we, ke be nawbangtirinyan ema nen: Bêsarani, Elmaszani Kenûle, Mirz Şefi Kolyayi, Mewlewi Tawgozi, Mela Cebari Sey Yaqî, Sey Salîhi Kırmaşani, ke serdemî jiyanîyan egerê tewe bo sedekani şanzdehem ta seretay sedey bistem. Evey lêreda şayani bas e gelêk lemâne be reçelek Hewrami nebûn, belam "Hewrami" yan bekar hênawê, weku zimanêki edebi bo şîr witin, çunke ta seretay sedey nozdehem le hemû ew nawçaney Kurdistan da ke ekwîne rojhelat û xwarûy zêy gewrewe ta Kirmenşâ Hewrami zimanî edebi buwe.

Konturin ew şairaneş ke be şêwey "Ceziri" şuriyan witibê, Melay Ceziri w Eli Heriri w Feqê Teyran in, ke serdemî jiyanîyan egerê tewe bo niwey duwemi sedey şanzdehem û niwey yekemi sedey hevdehem. (5)

Le naverasti sedey nozdehemewe be şêwey Ceziri bêcge le şîr pexşanîş nusrawe. Belgey emeş nûsinewani Mela Mehmudi Bayezidi ye, ke le sedey nozdehem da jiyawe w daneri "ADAT Û RISU-MATNAMEY EKRADIYE" ye. (6) Herweha rojnamey KURDISTAN, ke le 22/8/1898 da yekem jîmarey le QAHIRE derçû (7) le seretay siyekanewe, le nusini em şêweye da, le tenîş tipi erebiywê tipi latiniş be kar dêt, be taybeti le Turkiya w Sûriya. Le Yekêtiy Sovyet tipi Kiril (srilik) be kar dêt. Konturin ew şairaneş ke be şêwey 'Mukri' w paşan (Silêmani) wîtrawîn, egerê tewe bo niwey yekemi sedey nozdehem. Be nawbañtirin ew şairaney ke le sereta da em dû şêweyeyan bo şîr witin be kar hênawê Ehmedi Kor û Nali w Salim û Kurdi nin, ke hemûyan le sedey nozdehem da jiyawîn.

Şürekani Ehmedi KOR le rûy zimanewe ta radey ciyawaziy heye le gel ewaney Nali w Salim û Kurdi, belam le paşan em dû şêweye (Mukri w Silêmani) le şêwey edeb da ziyatir le yekti nizik ebinewe, weku le şürekani WEFAYI w EDEB MISSBAH ELDİWAN û HACI QADIRI KOYI w

(4) - Birwane pêşekiy diwanekî ! Zibacwiy, diwan Mela Perêşan. Kirmenşah. 1335/1956

(5) - Le barey serdemî jiyanî em şairanewe birûray ciyawaz heye. Lem bareyewe birwane ew witarey le govari BEYAN da, (J - 1/1972) le jîr nawi "Çend serincêki rexne girane" da nûsiwme.

(6) - Le Mosko le layen M.B. Rudinko le gel tercumey Rûsi da sali 1963 bilawkirawetew. Her em Mela Mehmudi Bayezidi ye "Şerefname" y le farsiyewe kirduwe be Kurdî (Kirmanci Jûrû).

SEX REZAY TALEBANI w MEHWİ w TAYERBEGİ CAF û gelêki tir da bo man derekewêt, ke ziyatir lew şêwey edebiye nizik ebinewe ke Nali w Salim û Kurdi binaxekeyan danawe w emro weku zimanêki edebi be zori le Kurdishî Eraq û Eran da be kar dêt (8) Le paş cengi cihaniye keke-mewe, em şêweye bo pexşanîş be kar hatuve. (Birwane Rojnamey PÊŞKEWTIN ke bo yekem car le sali 1918 da le Silêmani derçûwe) Bo nûsinewey em zimanê edebiye, tipi Erebi be kar dêt û êsta çapkirawê bem zimanê edebiye le hemû şêwekanî tiri zimanî kurdi zortir e w be taybeti le Kurdishî Eraq da berew ewe eçêt weku zimanêki RESMI le xuwendinxwane w dezgakanî miri da bîçespêt.

Be kurti konturin SERETAY BAWER PÊKIRAW bo edebi kurdi le şêwey HEWRAMÎ da egerê tewe bo kotayı sedey çuwardehem û seretay sedey panzdehem (Mesnewiyatekani Mela Perêşan), le şêwey CEZİRÎ da egerê tewe bo niwey dûwemi sedey şanzdehem û niwey yekemi sedey hevdehem (Şürekani Melay Ceziri w Eli Heriri w Feqê Teyran), le şêwey Silêmani da egerê tewe bo seretay sedey nozdehem (Şürekani Nali w Salim û Kurdi). Be şêwey Hewrami tenha şîr witrawe, belam Ceziri le naverasti sedey nozdehemewe, we Silêmani le kotayı cengi cihani yekemewe pexşanîşyan pê enûstî. (9)

Emanen birûrayi min le barey konturin nimûney bawerpêkirawi edebimanewe. Hiwam wa ye şarezayani ziman û edebi Kurdi lem bareyewe qelemi xoyan bixene kar û birûray xoyan derbibirin. Tikay lê burdınış ekem, ke le ber bêserçaweyi hemtiwani ziyatir dirêje be basekem bidem û belge w nimûney ziyatir bîhênimewe. Hiwadar im ke le duwa rojêki nizik da bitwanim lem bareyewe zortir binûsim û natewawiyekani em witare pür bikemewe. Witari ayndesim ba terxan bêt bo diyari kirdîni QONAXEKANI EDEBÎ KURDÎ, emca lêkoline we le QUTABXANE EDEBIYEKAN û nimûneyan le edebi Kurdi da.

(7) - Birwane, Kurdistan yekemîn rojnamey Kurdi. Bexdad 1972.

(8) - Le barey 'Zarawekani Zimanî Kurdi w Zimanî Edebi w Nûsinman' birwane ew witare le govari 'Zanyari', (Jimare 4/1971) da bilawîm kirdotewe.

(9) "Şex Hisêni Qazi" le naverasti sedey nozdehem da 'Mewlûd Name' yeki be zimanî kurdiy Silêmani danawe, ke lenêwan honırawe w pexşan da ewestê. Belam nûsini pexşan bem şêweye ziyatir egerê tewe bo kotayı Cengi Cihani Yekem weka basman kird.



MURHIM SÜT

Demekê, gava derheqa pê şketina kurdêن Yekîti Sovîyet dibû xeberdan, merî dikaribû nava gotarekê da derheqa serfiraziyê n her derecada destanî gili bikira. Lê iro ew destanîn haqasî gelein, ku em mecbûr dibil paraveyî derecakin û derheqa her derecekê da pê şketina meda, cihê gilîkin. Carna jî ûsa diqewime, ku derheqa destanînê d kurdekî Sovîyetda gotarek jî têrê nake, ku bê berçava, ka ew bi saya qeydê meyî sosiyalistîyê, jîyanê da mîyaserkîrina sîyaseta Lenînîyê ye miletiyê gîhîştiye çito serfiraziyê.

Benda xweye îroyînda emê têne derheqa derecke pê şketina me - dereca hunermendiyê, diharast ser mesela artîstên Sovîyetstanê ye kurda gilîkin.

Vê demê bajaren Yekîti Sovîyetê Moskow, Leningradê, Erêvanê, Tîblisi, Gronîyê û bajaren mayînda gelek artîstên kurdê profesional hene. Navdengê hineka ji wana temamîya welê tda eyane, derheqa wana û hostatîya wanda gelek cara rojname û kovaren Sovîyetê û wela-tên derekeye cihê - cihê da hatine çapkiranê, gava gili hatîye ortê,



*Temûrî Kelîl*

gotinê: filan artist eslê xweva kurde. Bi saya van yeka gel û neteweyê n welatê me nasîya xwe dane pê şketina kurdên Sovîyet.

Îro dota kurd Nazî Şîrayî artîsta sîrkîye dinêeyane, ewledê kurd Paşa Poladov rejîsorê têatre Yêrêvanêye pantomîmayê ye serkeye, Ebdule Muhemed reqşvanê koma bajare Groznyêye bi navê "Vaynax" e, Vova û Natêla Qasim artîstên balê têne li bajare Leningradê, Zîna Telo dengbêja koma Tîbilisiye "Rêro" ê bûye û gelekên mayîn.

Niha ser mesela wan artîsta û hinekêñ dinêda emê bi hûrgili bêjin.

Nazî Şirayî... Ev navekî pir na-ser li cihanê, bi taybefî ji bona kurda. Ewê ew nav bi xwe peyda kiryê. Dota kurd -Naza Şirayî, eva 35 sala zê detire, ku ser dikêñ sîrkêñ Yekîti Soviyet û welatêñ cihanêye cihê-cihê, cilê kurdiye reng-rengî li xwekirî amadekara hewas-hijmekar dihêle. Artîsta komera Ûrisê tê ye Sovetiyyê ye Sosiyalîstîyyê ye Fêdêrafiyyê emekdar salêñ cihê-cihê sîrkêñ Tbîlis û Erêvanêda lîstîye, lê pa-sê çawa artîsta nav û deng, çûye sîrka Moskow û hetanî niha jî wêderê pêşda tê. Lîstika wêda hejmarêñ ûsa hene, ku hetanî niha jî cihanêda kesira li hev ne hatîye wana biwekilîne. Bo nimûnê, ew du defê biçûk digre destêñ xwe, hevra berdide, defa destê rastê ser milê wêra derbaz dibe diçe ser milê dinê, defa dinê jî wî awahî, ber hevra ser patika wêra derbaz dibin û ne hev dikevin, ne jî dikevin. Lê ensiklopediya ermenîyyê Sovetiyyê hejmarêke xweda derheqa Nazî Şirayî da nîvîsiye, ku hejamra wêye "Heykelên tûne" sertaca lîstikêñ wêye.

Van salêñ dawî ez li Pragâê bûm. Wan roja sîrka Moskow jî wir bû û ser afîşen pêşdahatinêñ sîrka dinê yêyan wêna dota kurd bû. Ez êvarê tevî bermalîya xwe û çend kurdêñ Kurdistanê, ku li Prag dixwendin, cûnê sîrkê û me nasîya xwe da Nazîyê. Min çend pirs danê, Ewê derheqa xwe û lîstika xweda awa minra got.

- Hejmara minê here hizkirî ewe, gava ez cilê kurmancî xwedîkim, bi destâ miqamê kurdî lê dixim, lê bi herdu linga jî ser haceta sazbendîye (mûzîka) anegor miqamê kurdî lê dixim. Paşê nas-nenas min pirs dikin: "Ev çi sazbendîye, ya kîjan mîletîye ?" Ez kubar bersîva wan didim, ku

ya kurdiye û ez jî kurdim. Paşêgilî tê ser gelê min, ez jî wanre qala kurda dikim.

Belê, Nazî Şirayî her dera - ji Erêvanê girtî hetanî Parîzê, ji Lenîngradê hetanî Iranê, Turkîya yê hetanî Amêrikayê, her dera timê jî navê kurdêñ Soviyet bilind xwey kiriye, mala xwe bi xâlîçê kurdiye ciwanva xemilan-diye.

Jina kurd timê ji sazbendîye hiz kiriye, li şaya, govenda, bîndarûka sitiraye. Hîmdarê edebî-yeta ermenîya, xêrxazê gelê kurda Xaçatûr Abovyan gotiye, ku her kurdek bi ruhê xweva dengbêj (sitiranvan) an jî helbest-vane. Lê tenê bi saya qeydê Sovêtiyyê mecal kete kurda, ku hunerê xwe, zêñ û meriffeta xwe şanî bi hezara temâşevanêñ gelêñ cihê-cihê bikin.

Zîna Telo çend sala bûye komekdara rîjîsorê têatra Tibîlisi yê ser navê Grîboedov, paşê bûye dengbêja koma stiranêye bi nav û deng ya bi navê "Rêro". Çend sêlikêñ stiranêñ wê derketine. Vê gavê ew rîjîsora têatra Tîvilisiye kurdaye cimetîyyêye. Wêra tevayî kubreke kurmancî li zarê wêye, lema jî gava çend sala pêşda paytexî komera Gurcistanêye biratiyyê rîdaksiyonâ pêlweşa (radîo) kurdî hate vekirinê, wê tekîş kirin û hetanî iro jî ew dîktora (xeberdankir, peyvkar) wê pêlweşeye jî, wek peyvkarâ pêlweşa Rewanêye kurdî Eznîva Reşîde hêja bi radîo yê tevî bi hezaran kurda xeberdide.

Derheqa artîstê komera Çêçêno - İngûşîayêye avtonome emekdar Ebdule - Muhemedda - me çend sal pêşda hinek tişt ji miqaleke rojnema "Rya teze" pê hesyane. Pey wê miqalêra min xwest derheqa wî ewledê kurdayî hêjada bizanibim. Pey pirs - pirs yara ra çend melûmetî ketine

destê min. Ew wextêda li zanîngeha Tibîlisiyê ye xorê yografiîda (reqasa bedewtlyê) ya dewletêda ber destê artîstê Yekîti Soviyetê cimetîyyê Vaxtang çabûkîyanî hîn bûye. Koma bi navê "Vaynax" da, li ku ew idî 20 salî zê detire pêşda tê, reqasçîyê serekeye. Ew ser dika minanî teyrekî baz direqise û ser afîşen pêşdahatinê wê komê wêneyê wî bi wî awahî jî hatîye kişandin. Sala 1982' a, 30' ê meha novê bêr ji Moskow bi dûrdîtinoka (têlê vîzîyon) pêşdahatina wê komê nîşan dan. Em gelek temaşçîyara tevayî reqasa wîye çapik û çelengva heyr - hijmakar man. Dema vir pêlek pêşda min bi têlêfonê Ebdule ra xebarda, ewî bi kurmancîke delal bersîva min da. Gava min jê pîrsî ku ne axir bajarê Grozniyê da kurd an tunene, an jî kêm hene, ew ji ku usa xweş kurmancî gotina dike, ewî bersîva min da û got, ku dema ew diya xwera wextêda ji Kurdistanâ Iranê hatine, diya wî tenê kurmancî zanibûye û pêra hetanî niha jî kurdî xeberdide.

Xwendevanêñ kovarê yê delal ! Ebdule Muhemed jî koma xwera tevayî pir cara çûye Moskvayê û Hordananê, Vladivostokê û Sûriyayê, Mozambîke û Taşkendê. Çawa hemû artîstêñ Yekîti Soviyetê kurde profesiyonal, herweha rîjîsorê têatra Erêvanêyi pantomîmaêyi (têatroa bê deng) sereke Paşayê Reşîd Poladov aliye dereca xweda xwedîyê xwendina bilindin. Lê Paşa Poladov 2 institut temam kirine, yek li Moskow, yek jî Lenîngradê. Teatroyê wî awahî Soviyet tistanêda çend hebin. Serokê yekê ji wana lawê kurde. Ew çend spêktaklêñ teatroya xweda êlemîntê (nimûn) folklorâ kurda daye xebatê. Ew yek femdariye, ji ber ku nava deba kurdada, erf - edetê meda derecêd pantomîmê hene, çawa bo nimûne, dema kosegelf

digere, gava bûka nuh bûktiyê dike ciyên mayîn. Çawa em pê hesyan, têatro hazir dibe bi motîvê piêsa "Xecê û Siyabend" spêktakleke bê deng nişanke.

Wextêda miqaleke Paşa Poladov rojnema kurdîye "Riya teze" da çap bûye bi sernivîsara "Pantomîn nava deba kurdada". Lê derheqa Paşa Poladov û têatroya, ku ew serokatiyê lê dike, miqale çap bûne kovar û rojnemêd merkeziyê ye "Şirk û êstrada", "Sovê tskaya kultura", "Têatralnaya İskustvo" û gelekîn mayîn da.

Eva çend sale, ku du ewledê cimeta kurda, xwîşk û bira Vova û Natêla Qasim têatroya Lenîngradêye, akademiyêye, operayê û baletêye dewletêda dilizin. Ewana artîstêna baletêye naskirîne. Vovayê Qasim Ecemov dilqê (rola) serekeda dilize. Kovara Moskow bi navê "Têatralnaya jîzn" hejmara xweye sala pare î. da derheqa hostatiya wîda ser 2 rûpêlî miqaleke mezin çap kiriye.

Ewî hetanî niha dilqê usaye dijwarda bi serfirazî listiye, çawa ku dilqê Romeo baleta Prokof'yêye "Romêo û Cülyîetda", Arman - baleta Aram Xaçatûryane "Gayane" da û yêñ mayînda. Hetanî niha xwîşk û birayê bineciyê bajarê Tiblisiyê yi wextekê tevî têatroya xweye dinê eyan çûne welatê Avûstûriyayê, İtali yayê, Mongoliyayê, komera Almaniyayêye Dêmokratiyê û hunerê xwe nîşanî gelek cimetêd cihanê kirine.

Artîstekî kurdî mayîn Hesenê Quliye. Eva çend salin, ku ew artîstê têatroya Erêvanê ya dramatîkiyêye. Nava wan sala da gelek dilqada listiye. Van axiriya, gava ewê têatroyê spêktakla "Hamlet" danî, Hesenê Qulî dilqê keşîş da kivş kirin û ewî bi listika xwe maşoqê hunermendiyê zengendirî hîşt. Hazira (amadekara),

usa jî rojname û kovarê komerê qîmetekî bilind dane hostatiya wî. Hesenê Qulî kinofilmada jî lîsiye. Van demê n paşin, gava kinofilmâ bi navê "Piş hevt ciyada" nîşan dan, dilqekî serekeda ewî dilist. Hesenê Qulî demeke dirêj bûye rîjîsorê têatroya Elegezê ye kurdaye cimetiyê.

Artîstêna kurd xwezma dereca sîrkêda pirin. Mesele, Sertîv Mineralov wextêda kloûnê (mes-qereçî, henekçî) sîrka Tiblisiyê bûye, pir sala Nazî Şirayîra tevayî usa jî sîrka Yê rîvanê da pê şda hatiye. Têmûrê Tesinî fokisçî - laqirdçîyê sîrkusa Tiblisiyê bûye û pêra jî li filarmoniya Gurcistanêda, wextê konsertê êstrada-yê pê şda hatiye. Niha ew navça Gurcistanêye Gardabaniyê da koçka çandêda serekê koma artîstêna sîrkêye. Ezîzê Bişar niha artîstê sîrka Tiblisiyêye. Ew hew şa mala xweda gelek terewila xwedî dike. Sîrkêda ew du janarda pê şda tê, cîkî çawa fokisçî, cîkî jî terewila kedî dike. Derheqa hostatiya wîda nîşine rojnema Bilgariyayê "Paralêl", kovara Moskvayê "Sovê tskaya êstrada û sîrk", herwaha pir rojname û kovarên Gurcistanê.

Gava çend sal pê şda xwendekar û roşinbîrêñ kurdêñ Tiblisiyê hatine mîvanîya kurdêñ Yêrêvanê û tevî civîna sazbendî û lîste-

ratûra kurda bûn, wêda Ezîzê Bişar çend foks kirin û amadekara hewas - hijmekar (metel, zengendirî) hîştin..

Bîş van artîstê profesyonal, usa jî gelek artîstê kurdaye xwe-xwehînbûyî hene li têatroya Tiblisiyêye kurdâ û ya Elegezêye kurdaye gefêriye. Pir artîstêna xwedî şuret û zirekya pir di nava 30'î zê detir radfopîyesen pê weşa kurdîda listine, ku bi serokatî û inîşiyatîva serokê radiyooyê wê demê Xelilê Çaçan Mûradov hâtine nîşarê. Ji artîstêna kurdaye li têatroya Elegezêye berê mirov dikare navê dota kurde jêhatî Ezîzî Reşîd bide, lê ji pêşewitiya şazbendiya me - navê seroka koma kurdaye stran û reqasêye dewletê - navê Sûsîka Simo hêja-yê bidin.

Ango, we texmîn kir, ku artîstêna Sovyetistanêye kurd gîhişti-ne çito serfirazîyê ne tenê nav kurda û çend komerada, lê usa jî temamiya Sovyetistanê û wela-têna cihanê. A bona van destanî-nane, çawa ku Sêkrê tarê Komîta Navbendî ya Partiya Sovyetîye Komünîstîyêye sereke hevalê Yu V. Andropov nava kîlma xweye li civîna şaynetiye bona 60 - salîya teşkîlbûna Yekîtiya Sovyet da kivşê, wekî kurdêñ Sovyet jî zûda Sovyetistan hesab dîkin we-latê xwe.



Nazi Şirayî, artîsta kurd ya koma université.

# BERPIRSIYARIYA KARÊ BERHEVKIRINA WÊJEYA KURDİ YA DEVKİ

**II**

M. Eli

Ev du- sê salin, li Swêd kovarek, du kovar, ji bo zarokan bi zmanê kurdi dertên. Carnan hin çirokêن kurdi yêñ zarokan ku li Kurdistanê, bi salan me ji devê dapir û bapirêñ xwe dibihistin. Di wan de dertên. Ji aliyê din disa li Swêd du- sê pirtûk çapbûn ku ji nivisandiya wan çirokêñ zarokan ên devki pêk hatine. Qasi ku min li çirokêñ van kovar û pirtûkan mîzekr, min dit ku bi rasti hin xaxêñ gîran hatiye serê wan. Gava tişte min li Kurdistanê ji devê çirokbêj û stranbêjan dibihist da bira xwe û min li yêñ nivisandiyêñ vir nihêrt min dit ku, nivisandinêñ vêderê wan çirokêñ me ji nunqê xelas nekirine. Di serpe geraneyî gîran ji wan lê xistiye. Him ji rumeta xwe ya wêjeyi û him ji ji kêrhatiyêñ xwe yêñ pedagojik û hindekari gelek tişt windakirine.

Ya pêşin ew e ku, van çirokêñ hatine nivisandin u bi taybeti yêñ di pirtukan de hatine berhevkîrin, bi zmanê xwe êdi ne çirokêñ zarokan e. Çirok li gor peyvanka zarokan nehatine nivisandin. Pengala avakirina cumlan ne li gora wan sivik û kurt e. Ne bi nawerokê, lê bi zmanê xwe ew xitabi mezinan dikin.

Ya din, hinan ji wan, gelek tişt di kêrhatiya xwe ya fêrkirina zmanê Kurdi û kêrhatiya xwe ya pedagojik wînda kîrme. Dixwazim vê yekê bi çend çirokêñ nivisandi bîdim nişandin. Li Swêd çirokeke li du cîha hat nivisandin. Kovara Hêvi yê navê wê kiribû "Hedlik û Bedlik". Lê di pirtûka bi navê

"Mir Zoro" de - ya ji bal M. Emin Bozarslan ve hatiye berhevkîrin navê wê "Hedlik û Bedlik" e. Mesela nav ne pir giring e. Li Kurdistanê ev çirok bi gelek navan hatiye navdar. Oasi ku min bîhistiye, navê wê "Şengê û Pengê" ye, le li herêma Cizirê, navê wê "Xezalû çû dahikê" ye. Elfaba Kurdi ya bi zaravayê sorani -Li Kurdistana Iranê ji bal Parti Demokrati Kurdistani Iran ve hatiye çapkirin- de ji navê wê "Titli û Pitli" ye. Bawerim, wê xwendevan dîbirbinin; çiroka bizinê û du karîken wê ye. Awayê nivisandina vê çirokê di "Hêvi" û di "Mir Zoro" de kîme. Lewra dema bi devki tê gotin weki gelek çirokê Kurdi yêñ zarokan, ev çirok ji hin derêñ wê bi lihevhatiyan tê domandin. Lê di van nivisan de ev li hevhati hatine qutkîrin. Lihevhatiya vê çirokê qasi ku ez dizanum yek jê ev e:

Bizin her sibe deri li ser karikêñ xwe radide û diçe çêrê. Wexta dana vedigere tê bez deri û bi vi awayi bang li karikêñ xwe dike:

Şenga min penga min  
 Diya we çuye zozana  
 Xwariye pelên qızwana  
 Şir ketiye guhana  
 Deri vekin  
 Diya we hatiye dana.

Gava karîk bi vi awayi dengê diya xwe dibihizin deri lê vedîkin. Di vê çirokê de axaftina nabêna gur û bizinê ji bi lihevhatiyan tê gotin. Lê min nikaribu ez tekuz hin bibim ka ev lihevhati bi çi awayi tê gotin. Loma ji di min biborin ku ez nikarim

wi bîri ji di vir de pê şkeşî çavê we bikim.

Çirokek dîn... Çiroka "kêz Xatun" ê. Ev çirok ji li Swêd ji bal M. Emin Bozarslan ve hat xistin warê nivisandinê. Lê tiştê nivisandi ji yê devki gelek kêm e û cardin rûmet û kêrhatiya xwe ji gelek alyan de. Welê me li jor ji got winda kiriye. Ev çirok ji, bawerim, wê di bira xwendevanan bê. Kêz xatûn ji xwe rûz li mîrekî digere. Diçe müşk mar dike. Rojekê diciñ beravê. Li ber simê ga - ku baran bariyaye û şûna simê ga tije av buye - cila dışon. Ji gundeki nêz, dengê defê tê. Müsk diçe gund, ber dawetê ku hinek goşt û birinc bixwe û hineki ji têxe bin zimanê xwe ji Kêz Xatûnê re bine. Lê gava Kêz Xatûn bi tenê dîmine lingê wê dişemite, dikeve nava çamurê (heriyê). Dike nake, nikare xwe ji çamurê derxe. Wê gavê siwarek di ber wê re derbas dîbe, ku biçe gundê dawetê. Kêz Xatûn bang dike dibêje:

Lo siwaro hendel mendel  
Gulka kumê te panzdeh wersel  
Ku tu dici mala Mir Evdel  
Bêje;  
Mîsko, mîsko mîskkaviro.  
Kezi kuro  
Heban çiro  
Bêje;  
Kêzê Kêzê kêzxatûnê  
Bi fistanê gelavdûnê  
Bi şimika req reqûnê  
Ketiye heriyê heta bi qûnê  
Ya tu xwe biginê ya neginê.

Her wiha di çiroka "Pirê û Dik" de ya ku ji bal Kovara "Kulilk" ê ve hat weşandin. Di wê de ji gava dik û pirê şer dîkin û dik bi rê di keve, diçe alikariyekê bivine, bine hola xwe ji pirê hilde, di nabêna wi û lawir û tiştên rasti wi tênen de xeberdan çêdîbin. Ev xeberdan hemi bi lihevhatiyan hatine rêstin. Her weki:

Dik çû, çû... rasti tepika rêxê hat. Tepika bang kir got:

- Ha diko !

Diko xeyidi got:

- Wey mirina bavê diko !..

Tepika rêxe got:

- Lê bêjim çi ?

Diko got:

- Bêje; diko, diko dikil axa, dermali satil axa, fermani Badîl axa, dici ku ? ..

Tepika rêxê got:

- Diko, diko, dikil axa, dermali satil axa, fermani Badîl axa, dici ku ? ..

Diko got:

Diçim çol û çolistan  
Diçim ber û beristan  
Diçim eskerekî giran  
Binim ser pira du dîran  
Ku qorîka min şikand  
Ji bona seriki çortan

Baweriya min ew e, ku hebûna lihevhatiyan di çirokê zarokan de sedemê wan hene. Ew ji zarokan re dîbin navgireñ hin kırma zman. Lihevhati û caribûna wan di çirokan de bala zarokan dikşine, hisê wan li ser peyvên çirokê diciñine û bî vi hawî hêdi hêdi hin peyvên nuh dikeve peyvâdanka wan û nakêlê ku ev peyv zû bi zû ji bira wan derkeve. Piştre, bî balkêşıya van lihevhatiyan çirok xwe bi zarokan dide hîzîrin û ramana naveroka xwe ji dixe serê wan. Bi kurtebiri ev lihevhati di çirokan de dîbin navgirek xurt ji bo rûmeta wan a wêjeyi, ji bo kêrhatiya wani fîrkirina zman rast axaftinê û pedagogik. Helbet ev çirok, ji desten niviskarêñ gîhaştî dernehatine. Ji bal mekteb û enstituyêñ hindekarıya zarokan nehatine nivisandin. Lê ew fêkriyêñ jiyan û serboriyêñ dê û bavan yêñ salan e. Di pingara jiyan û çanda civakê a li ser gihadına bîçûkan de pijiyan e. Loma ji ew pirtirin di devê dapiran de xweş û şerin in.

Van mîzakêñ han ku me nişan dan ji didin xu-yakirin ku karê berhevkirin û nivisandina wêjeya gelêri ne kareki hêsa ye, û berpîrsîyariki mezîn dixe ser milen mirovan. Di vê niqtê de dixwazin bêjim ku berbiçavkirina van minakan qesta min a esasi ne ew e ku ez rexne li berhevkarê van çirokan bigrim. Pirtirin armanca min ew e, ku ez giringya berhevkirina wêjeya me ya gelêri ya devki bî rêk û pêk bi sebr û zanin bidim nişandan

Ere, raste mafê me heye ku em rexnê li şashi û kêmasiyêñ berhevkaran bigrim. Lê bî ya mun ger me şashi an kêmasi di berhevokêñ nivisandi de ditin a giringturin beri rexneyan ew e ku em rastnivisa wan rojekê zûtr biweşinin û berbiçavkin. Lew ra her çiqas kêmasi û şasyiñ berhevkaran ji rêdîdin ku wêjeya di nav gel de bi kil û kêmasiyan têkevin rûpelêñ pirtûkan. Lê berhevkarék çiqas zana, bî sebir û hinermend be ji cardin bî serê xwe seri di vi kari re dernaxe. Bivê nevê wê kêmasi hebin. Ev kar karê dewletan, rêxistinêñ dewletê ne. Lê gava ku dewletek me û rêxistinêñ me yêñ ji bo berhevkirina vi kari ninin, divê niviskar zmanzan, folklorzan û dîlsozênmê destbidin hey, herkes ji vi alide bî berpîrsîyariya xwe re rabe. A di esasi de dixwazim wê berbiçavbikum.

**GUNDÊ ME**

Ev gund  
Warê me ye  
Ji çem dûr ava bû ye.

Li nîvê gund  
Em di xanîkî biçük de  
Ji sê - çar latên mezin  
Û çend kevirê n rût pêk hafî ye  
Di rengê kokeleke nizm de.

Di ser me re  
Qereçîyan konê xwe danî ne  
Zarok pîrr  
Tazî u birçî ne  
Parsû di çermê laşê wan re  
dikin derkevin  
Mê şan ew can xwarin  
Kezebê n dayikan, dilê n ciwan.

Li hemberê gundê me  
Çiyakî şîn  
Çekdarê n me tê de ne  
Siwarê n namûse.

Derwêş Ferho

**BANG**

Divê em rabim ser xwe  
Dijminan bîdîn ber xwe  
Êris bikin wek şêran  
Rizgar kîn welatê xwe.

Îro sedsala bistan  
Disa em li bindestan  
Şerm û fedîye jî mera  
Xwina sorda Kurdistan.  
Êdi bese bindesti  
Kêr goşt ket, gihişt hesti  
Gelên Kurd kîrm kole  
Ramanên olperesti

Rizê Gur'an bang dîke  
Dilşewat gazi dîke,  
Rizgariya me sosyalizm  
Wê hêvi bawer dîke.

Rizê Gur'an

**HESTIM DILIM**

Hestim dilim,  
Avêtey pelegeşek bû.  
Be tülemarî rîyî  
Damarekan da xizî.  
Paş geştêk le gorepanî  
Xoradan da  
Rijayewa kanî dil.  
Palawtîra, xonçe bû,  
Pişkût, bizeyekî hate  
Ser lêwe naskekanî  
Tuwayewa bûwe esrin,  
Bo razanewey çawî nesrin.

Rehman

**EVİNDARI EVİNDARI**

Roja min bû şeva tari  
Jî bira-min tu qet nari  
Gelek zor e evindari  
Evindari , evindari.  
  
Dûr nekeve ji min canê  
Bey te jin nabe l' cihanê  
Wek xweşîya gul û rihanê  
Evindari , evindari.

Tu wek gulê h nav dila  
Dengê te wekê bilbila  
Ez kîrm nav derd û kula  
Evindari , evindari .

Xera neke vê evinê  
Evini xweş e şerinê  
Çav kor kîrm ji girinê  
Evindari , evindari.

M.HESINPAK

**MELÜL**

Çavê mun bila  
bi te  
ne keve !  
Dilê min dî ê şe bi halê min,  
Şevê girtigehan pir dirêjin  
Kin di dilê mun de kutik e  
Li vir spêd;

ne bi banga dika  
ne ji bi guriya pitika  
di teqe

Li vir;  
Nalin girtivana radike.  
Çavê mun bila  
bi te  
ne keve !  
Dilê min dî ê şe bi halê me....

D. Avedis

**LAWÊN XWÎNMĲAN****NABIN DOST**

Derbas bûn  
Paşa û serok pir hatin cûn  
Li bav û kalan siwar bûn  
Gel cûn pê şve, em man li şûn.

Segê dêl qut nabe taşî  
Tu biratî j' kê dixwazî ?  
Ger ez nemrim, ger tu nemri,  
Azadî çawa dê bijî ?

Kerê sê qurş sîpê du zolt  
Laşê rûvî nadî te goşt  
Ber mirinê bavê min got  
Lawêن xwînmijan nabin dost.

BÊNAV



# COGRAFYA KURDISTAN

*Cigeranvin*

Perçê yekem ji nivişa Minoris kî (cugrafya) Kurdistanê -ye- û li gora dîtin û awira (Minoriskî) cugrafya Kurdistanê gelek fireh û mezin hatiye danîn û nivîsandin.

Minoriskî dibêji: Ji bo ko em karibin baş vî perçî ji asya nasbîkin, ko emê jê mijûl bibin, gereke em du tiştên bi heve girêdayî /çiyayê Erarat û Xelîcê Îskenderon/ bidin xuyakirin û ji wan mijûl bibin.

Hin zencîrên çiya di perçê jêrî ji Ararat û li ser dirêjayaîa du hezar fersexî ber bi jêrve diçin ko xwe dighênin hev û yekîtiyekê çedikin û ji jor ber bi jêr ve diçin, û dawî çend zencîran çedikin ko ber bi jêrê rojhilate ve dighêne ser Xelîcê Farisi.

Perçê yekem ji van zencîrên çiyayê Erarat jêre dibêjin, /zencîrên sînorê navbera Turkiya û Iran/ ko wê hindamê dikî du perçen çiya û pengava /WAN/ û /ORMIYE/ ji hev cuda dikî. Yanî Wan dikevî bin destê Turkiya û ORMIYE dikevî bin destê Iran. Lê perçê diwem ji vê zencîrê hetta sînorê Turkiya û welatê Faris dirêj dibî.

Li gora daxwazêñ kevnare ji van herdû çiyayêñ bilind re ko dikevin nav zencîra çiyayêñ Iran û welatê navbera herdû çeman, jêre digotin Zagros - Zaxo.

Çiyayê Agrîdax ji Erarat berbijêr dirêj dibî, û Qafqasê rûsî, ji zencîra çiyayêñ Ermenistan vediqetêñ û careke dî dighêñ hev û

eger em berê xwe bidin Îskende rûnê, emê piştî hindikî ji rajorê wê zencîra çiyayê Entîtores bîbênin ko van çiyayê ko diçin ser pingava reş û navbera herdû çeman ji hev perçê dikî. Lê bi awakî tevayî berî Entîtoros li rajorê rojhilate bi (3) sê çiyan berjor dabin: Rajor, Navîn, Toros.

Ermenistanê rajêr ko berê xwe didî Qars, Mako, Erarat. Ser kaniyêñ sereke ko çemê ferat dadiigrin, ji wan çiyayê Enfitoros derdikevin ko du çemên mezin dighênin ser hev.

I- Çemê - Mûradê, ko ji newala Elacgîr - Eleşkurd, derdikevî û du çemê dî ko jêre dibêjin Ava reş yan Ferat, ko ji Erzerom derdikevi. Û çemê Aras, ko dikevî navbera van herdû avan, ji zencîrê çiyayê Bingol derdikevî û bi rika van herdû avan, ber bi rajor ve diçî.

Lê herdû çemêñ dî, çemê Mûradê û çemê Ferat, di serê pêşide ber bi rajêr ve diçin û ava Mûradê, di cîkî de nêzîkî li çemê Dicle dikî, lê nikarî xwe bîghêñ ser û nêzîkî Xerbûtê tevlî ava reş; Ferat dibî û piştî ko herdû dighêne ser hev mezintirê çemêñ rojhilate navîn pêktêñ ko navê wî dibî Ferat, /2670/ fersexî û dixwazî bikevî nav sînga pingava - sîpî. Lê çiyayê Toros dikevî riya wî û naçare berê xwe didî rojhilate û dikevî ser Xelîcê Farisi.

Lê perçen zencîrên diwem, ko berê xwe didin rajêrê rojhilate

Îskenderûnê, ji çiyayêñ rajorê sîrya têne jimartin û ji wan re dibêjin. Zencîra çiyayê Toros û berê xwe didin rexê rojhilate û li-hindama pingava WAN hin jê vediqetin û ber bi rajorve diçî û zencîreke dî ber bi rajêr ve diçî sîmôrê faris, nêzîkî/ Kotor - Qutur dibî.

Herweku li rojhilate gola WAN ew çemêñ ko têne ser vê golê, ji wan perçen bilind, ko ji ava çemê Zabê mezin vediqetin û ev zencîrên bilind, ber bi rajêr ve berjêr dabin û du zencîrên bilind û nû, di - aferênin, ko kaniyêñ perçê jorî ji çemê Dicle di nav xwede hembêz dikî û ber bi jêrve dadikevin.



Lê çemê Dicle, berî ko ji çiya derkevî deşte, hindameke ji Ferat, tengtir distêñî. Çiyayê Cûdî - Güdî dikevî milê çepê wî, ko çîrokêñ kevnê rojhilate dibêjin; gemiya Nûh li ser vî çiyayî rawestiya ye ?

Belem çiyayê Colemêr ji çiyayê Cûdî bilindtirin û li çepê çemê Dicle û zabê mezin, dikevin. Ew zabê ko li nîvê rê dikevî nav çemê Dicle û bi hevre dighêne ser çemê Ferat û Şetilereb di - afirênin.

Ca, eger perçen jorîn ji çemê Ferat û hindamêñ gola WAN cihê kevnare ye, ko kurd têde hatine dîtin, lê perçen jêrîn ji Toros û peravêñ çemê Dicle /yêñ çepê/ Botan - Xerbût - û zabê - jorî bixwe welatê kevnareyê kurde, her wekû bawer dikim.

مەۇرۇش  
صۈرىپ

ئاسى - ۱۳۲ - سېلىنلىغا  
بىرىللىك



مەلىخىي ۹۰ مېتەر

دەپەنلىك

Em wazijeti qewni Kurd e, be gwêrevî xeriteyi têşayînî Kurd "Sör Mark Saykis" we xeriteyi etnografi "Qawar 'eni duwayî Iraq, Meccer Lóngrik" we xeriteyi hencîi "Uşbet-ul Ummâm, we xeriteyekî sari ke le sali 1912 da we 26 Agustos da le Siñela da bû. Zabitani erdari Hind teb'i kuralî we le ser inâfîmati ansiklopediya laham û "Küddîr-Muhacîrin amfîdir fîmîndîl" têxînave.

Eger em bixwazin ji welatê kurdêñ kevnare mijûl bibin, ko di destpêka tarîxê de kurd tê de rûniştî bûn, gereke em xwe berdin nav peçen rojhilateñ dûr û rajêr, ev (3) sê hindamêñ dawîn: Zençira çiyayêñ bilindêñ Ermenistan û Kurdistanâ Turkiya û çiyayêñ Faris yêñ rojava ne, ko birastî ev welatê kurde.

Her weha em dibênin, ko di iro de kurd di qadeke firehde rû-

niştiye, ko dikevî sînorê Turkiya, Faris û bajarê mendeli rojhilateñ Bexda û heta çiyayê Erarat û sînorî me derbas dikî û dikevî nav Qafqasê rûsyâ û kurd û ermen tevíshêv û dinav heyde rûniştî di zencirêñ çiyayêñ Ermenistanê de rûniştîne û bi hevre dijîn.

Û sînorê kurd di Turkiya de, li hindama Erzerom, dawî tê. Her wekû li rajêr kurdan hin hindâ-

mên fireh heta dawiya deşten navbera herdû çeman dagirtine.

Çawa, ko ji rexê rojava de çemê Ferat, yan bêtir birastî çemê Reş - Qereso xistine bin destê xwe. Lê li van sînoran, ra ne westiya ne û xwe berdane kûrahiya /ASYA/ biçük. Ne tenê jêre rojhilateñ Sêwas dagirtine, belkî jî, hin ji wan çûne heta hêla bajarê QONYA jî û bivî rengî xwe gihadine ser Pingava reş.

## XALTIYA GULÊ

Siyabend

Xaltiya Gulê got lawo destgiriyê te heya ji eskeriyê tê were cem xaltiya xwe. Lawo çi dibe, çi nabe, gundê we hinek tevíshêv e, dibe tiştek were serê te.

Gulê anî bi xwe re û gundêñ wan jî ji hev gelekî dûr bûn, çûndin û hatina herdû gundan ji hev tune bû. Gulê ma li cem xaltiya xwe. Gulê keçek gelek rind û li hevhatî bû. Bejna zirav û bilind, çav û brûwêñ wê reş û qeytanî, dev û lêvîn tenik, gerdena dirêj bi hemî tişten xwe mîna kareka xezalan bû.

Li gund maleke halê wan xweş heye û kurekî wan heye rezep e çav li xwe ye û li gund sê xwuşkîn wî jî bi mîr in. Li keçekî mîna Gulê digere. Mala wan û mala xaltiya Gulê ji hev ne dûr in. Bo vê yekê ew roja pêşî pê hesiya ku Gulê hatiye û bi xêrha-

tin da xaltiya Gulê û ewî ji xaltiya Gulê ra got, "xaltî lê ev hermet kiye ? ". Got: "lawo qîza xwa min e û ewê îsal li cem me be". Xaltiya Gulê ji zû va di xwest da qîza xwa wê bikeve mala wan, ji ber ku parîyê xaltî diket xweşiyê.

Xaltiya Gulê ew herdû bi hev qayil kirin û herdiwan ji hev ji dil ecibandin.

Ber ku Gulê bi destgirtibû hev revandin û çûn gundekî din.

Xaltiya Gulê rabû xeber gi-hand mala bavê xwestiyê Gulê. Ew ji çûm qereqolê ba cendirmân gîlî kirin. Herdû malan rahiştine hev bi gîlî û bertilan. Lê mala xwestiyê Gulê dolemendit bûn, zora wanê din birin.

Bi lêdan û işkenca cendirmân bavê lawik û diya wî û xwişeka

wî di heftiyekî de mirin û malê wan jî qet nema, lê Gulê ma ji xort re.

Ji ber ku malê xort nema, pir perişan bû û xaltiya Gulê rabû yeki di ji Gulê ra dit ku ew jî dolemendê gund bûn û bavê wî muxtar bû. Bi jin û zarû bû û Gulê ji xort sitandin, mala wî ji gund derxistin. Mîna dîna li xort hat.

Gulê çû ser hêwiyê û ewê û hêwîya xwe li hev nekirin, heroj şer û xirûcir kirin. Hêwîya Gulê nexweş ket, bi rojan nexweş ma ji lomêñ ciranan rabûn birin Diyarbekir ser tixtor û li Nexweşxanê razandin ku digotin jana zirav lê ketiye. Ew demeke dirêj ma li Nexweşxanê û me dit rojekê çardora wê hate gund.

Gulê ji hewiyê xilas bû, lê sê sêwî mane li stuwê wê. Barê mala wan jî bi giraniya xwe kete stuwê Gulê. Jiyana Gulê roj bi roj ne xweş bû, derdê malê, yê sê zarwêñ ji hêwîya wê mane û mîrê wê jî hin bi hin jê re nebaş di-be. Derdekî Gulê yî din derket ku qibêjin zarwê Gulê çenabin. Gulê li nav jinêñ gund sar e. Li ser kaniyê, li ber tendûrê, li rîya bêriyê çi jinêñ bi germî bi Gulê ra xeberdin tune ne. Xezûr û xesûya wê jî jê sar in, dibêjin xêr li ruwê wê tune ye.

Rojekê sibê zû bû, qîr li gund, lê zêdetir jî bi ber mala xezûrê Gulê va diçûn. Gulê li axurê bi benekî ve xwe daleqandiye û mi-riye.

# NAMÊN XWENDEVANAN

## JI REDAKSIYONA BERBANG RE

Min piraniya hejmarêñ Berbangê xwendin. Di piraniya wan de, redaksiyon li bendî rexne û nivîsara ye ji xwendevanêñ Berbangê. Ez bi xwe nikarim bêjim ku ez nivîskarim û ezê ji redaksiyonê re nivîsarêñ xwe rîkim. Lî belê ez karim bêjim ku ez xwendevanêñ Berbangê me û ez dixwazim rexnê xwe li redaksiyona Berbangê wek ku li jêrîn bikim. Daxwaza min ne rexne lê girtine, boyî ku Berbang ber bi xerabê here, lê hêviya min ew e ku Berbang bi rastî bibe kovareke kurdî, bi kurdiya baş û bi nivîsarêñ baş ji destê nivîskarêñ jêhatî, ji bo

doza Kurdistan bibe berdevk li nav kurdêñ derveyî welat. Ji bo başiya Berbangê daxwazêñ min evin :

1- Cî dana (mecala) nivîsandinê bidin hinek kesen ku meselên (dozêñ) kurdan yêñ îro û pir lazim di karin binivisiñin.

2- Hinek nivîsarêñ wek "xewnêñ oblomov..." ku têñ nivîsandin ji aliyê nivîskarêñ wek "M. Ferzend Baran" ku nîvê Berbangê digre û ti çarê ji doza kurdara neyêñê, gerek neyêne nivîsandin.

3- Hinek nivîskar; xûya dike ku bûne mîna xwediyê Berbangê û tim divê ku navêñ wan û nivîsarêñ wan di Berbangê de hebe. Heger ku mere her deh hejmara

bi darî hev bixê navêñ wan ke-san ji baş xûya bikê.

4- Heger kû nivîsar di destê we de nebin, êdî ne lazime kû hûn hema Berbangê bi tişte pûç dagirin. Hun karin hinek tiştên ku nivîskarêñ kurda berê nivîsandine bigrin û têde binivisiñin.

5- Wek ku minbihist; institüya kurda li Ferensayê biryar da bo şiklek tîpê nivîsandinê û gerek Berbang jî bi van tîpan binivisiñe. Yanî alfaba K. Bedirxan.

6- Bo ci rewşa Kurdistan jî, di her hejmarekê de bi kurşî nani-visin ? Gelo Kurdistan îro di bin lingê kûjan dizande di nale ?

Bi silavêñ min.

Bares

## Jî Redaksiyona Berbangê re !

Hevalêñ hêja,

Ez xwendevanekî Berbangê me. Bi derketina Berbangê yek valabûneki tiji bû. Tev kî masiyê xwe, disa veşanek hêjaye. Ez wek xwendevanek Berbangê dixwazim wezifeki dikeve ser milê min binim cih. Roja iro ez bi du tişta karim ew wezifeyi xwe binim cih. Jî wana ê yekemin; bi

xwendina û belav kirina Berbang ê ye. Rasti divê, ew wezifa xwe gor xwestina xwe ez pêknaginim. Sebebê pêknayina min destê min nine. Jî bo ku Berbang gelek hundîk têñ Suriyê. Daxwaza min ji redaksiyonê ev e ku, Berbang bi serûber bikeve destê min. Wezifeyê min a duyemin ev e ku; ji Berbang ra bikarıum nivîsandina bîşeyinim. Min nîha dest bi nivi-

sandina helbesta kiriye. Dîxwa zîm nivîsandina xwe ya helbesta berdewam bikim. Bo wi yekî daxwaza min ji hevalê redaksiyonê ev e ku, ser helbesten min bikaribin kîmasiyê min nişan bîdin. Û rexnê xwe lê bigrin.

Serfirazi jî we ra !

Ronak Dilxweş

## Jî Redaksiyona Berbangê re !

Hevalêñ bi qîmet û hêja, ji we-re silavêñ minî germ. Her mehek kovara we "Berbang" dikeve des tê min ez bi zêde pê kîfxweş dibim. Nexasim ji bo nivîsarêñ li ser dirokêñ civakî yêñ gelê mey qehreman.

Xebata we xebateke pir girînge ji bo zimanê kurdî, pir mezine ji bo doza gelê me. Divê kesek vê


xebatê hindik nebîne, ji ber go ev kar û xebat, çand û edebiyata kurdi gav bi gav bi pêş dixe.

Ez zaf dilxweşim bi derketina Berbang ji bo van du tiştan: Ya yekem; Berbang baş zengîne li ser çand û zimanê kurdî. Pir nivîskar helbestvan, dêmoqrat û welatparêz tê de dinivisiñin. Armanca van nivîskaran ew e ku, çanda Kurdî hin bi hin fireh bi-


be û bi lez pêş de here. Ya du-wem; hemû komel, rîexistin, parti yêñ pêşverû û dêmoqrat yêñ Kurdistanê li Swêd gihane hev û li ser bingehet yekîsi bi hevre kar dîkin. Bi rastî ev tiştekî pêvîst e û rinde ji bo yekîtiya hereketa Kurdistanê.

Her car a Berbang dîghê min, ez wê li nav hemû hevalan digerî nim.

H. Mejdel



# XACEREZ



## ÇEPERAST

- 1- Kesek ku jina wi an mêtê wê bimire. - Navê bajareki li Kurdistanê, navê wiye nuh Urfa ye.
- Şairek ji Kurdistanana Iraqe, dî nabena 1899 û 1965 yan de jiye. Helbestek wi:
- "Gerçi dujmin wa ezanê min be dili lal ebûm,
- Baş bîzanê kunci zindanım qutabixane ye.,
- 2 Arvan. - Li hinek hereman ji bo Asiman tê gotun.
- 3- Pronavê yekemin ê pirejimar. - Li dawiya dûa yê tê gotin.
- 4- Li Kurdistanê bajarek, 1946

ande cara yekem Komara Kurdistanê lê ava bû. - Bi dumili tu (berepaş).


- 5- Hevdeng, bê ferq: - Heywanek, li hinek hereman jêre huli, elelo, hulhuli ji dibêjn.
- 6- Zadek, dî beşê niskû kıziman de ye. - Şer, pevçûn, lhevixistin (berepaş).
- 7- Bêdeng, bêziman. - Biber, bacik.
- 8- Dawe, gaye. - Pronavê yekemêne yekejimar. - Jûre, menzel.
- 9- Gotina pirsê, qey, gelo (berepaş). - Xebat, iş, mijuli. - Eksa deng.


- 10- Birê pivazê. - Dergûş, lane, landık, bêşik.

## SEREJÊR

- 1- Li Kurdistanê bajarek ku merkeza petrole ye. - Pê pali tê krim.
- 2 Mûyê wec (berepaş). - Abori, iktisad.
- 3- Li Kurdistanana Iraqe bajarek.
- 4- Li hinek heremên Kurdistanê ji bo agir tê gotin.
- 5- Şaireki Kurd ji Kurdistanana Iraqe; paşnavê wi Peşew e.
- 6- Bicarekêde. - Têriq, rêçik.
- 7- Demek fiila zainê (berepaş). - Li Kurdistanê çemek ku pir bi nav û deng e.
- 8- Pê şpirtik (pê şqertaf - pê şdani) a cumla pirsê.
- 9- Li Kurdistanana Suriyê bajarek. - Ne tûj (berepaş).
- 10- Navek bîyani. - Tevlihev, têkilhev (berepaş).
- 11- Bi Kurdi ji bo Nedim tê gotin (berepaş).
- 12- Navê cil û bergê jinan, kiras.

**BERSIVA HEJMARA 13'AN**





## daxuyaniya xwebirçihıştinê

Jî mehek wê da li İstanbulê, li girtigehan, girti dest bî xwebirçihıştinê kîrin. Pişti demeki kurt ev daxuyani li gelek girtigehên Turkiyê û Kurdistanê belav bûn. Nuha nêziki 10 hezar girti jî bo daxwazêن jêrin xwe birçi dihêlin:

- Dawi jî bo işkence. Tedawi jî bo kesêن seqet û nexwêş,
- Qencekirina hoyê n girtigehan,
- Mafê hevditîna girtiyan û avûkat û merivê n wan,
- Dawi jî bo marşen faşist û leşkeri ku bî zorê bî girtiyan tên gotin,
- Dawi jî bo cilê n girtigehê, serbesti jî bo cilê n sivil,
- Azadi jî bo xwendîna pirtük û rojnaman.

Weki tê zanîn cûnta faşist zindanan bî kesên pê şverû û sosyalis va tiji kîr. Gelek kes hatin darvekirin û dî işkencyan de hatin kuştin. Lî cûnta faşist bî viya qayil nabe, li ser girtiyan zordestiyê n dîn ji pêk tine. Dî girtigeha Diyarbekrê da mafê xweşûştinê tune, jî nav xwarinan müşk û dûpişk derdikevin, nexweşîna Kolerayê ketîye nav girtiyan.

Daxuyaniya xwebirçihıştinê, li Turkiyê, li bajarê İstanbulê dest pêkir û li Ankara, İzmir, Adana velav bû û paşê derbasi bajarên Kurdistanê bû wek Diyarbekir û Erzerom. Gelek dê û bavê n girtiyan li ber girtigehan daxuyani pêk anin. 7 otobus jî İstanbulê girtin û çûn Enkerê ku ber-pirsîyarê cûntayê bîbinin. Bavê girtiyekî xwe li İstanbulê şewitand.

Daxuyaniyêن piştgiri li Ewrûpa ji dest pêkirine. Li Almanya Federal û Danimarkê paşê ji li Swêd gelek kes ketin vê daxuyaniyê. Li Swêdê Federasyona Komelên Kurdistanê, bî gelek rêxistinêن çepên Turkiyê re daxuyaniya xwebirçihıştinê pêk anîye. 60 kes dî vê daxuyaniyê da cih girtine. U televizyon û rojnamên Swêd li ser vê daxuyaniyê xeberan pê şkêş kîrin.

Daxwazên me ev in:

- Divê Xaça Sor girtigehan ziyaret bîke û alikariya wan a sihhi bike,
- Divê Amnesti Internasyonal dî mehkeman da hazır bîbe û peywendi bî girtiyan ra deyne,
- Divê hukumeta Swêd zorê bîde hukumeta turk ku rewşa girtiyan çê bîke.

Divê hemû hêz û kesên pê şverû piştgiriya vê daxuyaniyê bîkin.

— Bîmre Cûnta Faşist a leşkeri !

FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTANÊ  
LI SWÊD  
KOMİTA KARGER